

WELAT



Serokê Komîteya Jeopolîtîk a Dûmaya
Dewletê Aleksey Valentinoviç Mitrofanov:

Fersenda

dewleteke kuranhev

Rûpel 3

Lêgerîner Ahmet Aras

Evdal, ne tenê dengbêj
destanbêj e jî

Rûpel 8-9

Medenî Ferho

PEN'a kurd divê çi bike?

Rûpel 13

AKIN

Keştiya tirkan noq dibe
Amerîka jî pê re

Rûpel 4-5

NAVEROK



Sevdâ Eldemîr: Zuğuşî B'erep

7



Azad Zêr: Pênûsat te çeka te bû

11



D.Ş. Tizyanî: Zîwanê ma/ Alfaba û yekgirtina zaravayên kurdî

13

Ji Xwendevanan

ÇAWA ku roj li ser welatê me bi zorê bi perdeyê reş hate veşartin, wisa jî pêwîst bû ku roj bi zorê ji nû ve bê derxistin. Tiştê ku tevgera rizgarî di 15'ê Gelawêjê de ji kir, ew bû. Perda reş ne bes roj dabû girtin; stêrkên evîni yên Mem û Zînê, Siyabend û Xecê jî dabûn veşartin.

Tevgêra rizgariyê di bin serokatiya mirovê mezin de, hilm bi hilm, roj bi roj li ser çiyayên azadiyê, Mem û Zînê hemdemî dane afirandin. Bi Mem û Zînê hemdemî çiyayên welatê rojê ji nû ve bi hemû heybet û azameta xwe (ew cihê ku wekî dergûşa mirovahiyê tê nasîn û bi şarîstaniyên herî payebilind a bapîrên Medan, mohra xwe li dîroka mirovahiyê daye), careke din wê ristê dilîze. Îro welatê me û gelê me wezîfeya xwe ya dîrokî carekê din bi tevgera azadiyê pêk tîne. Belê, roja nû, stêrkên nû rîya hemû welatparêzan ronî dîke.

MEHMET ÖZER

TEVGËRA Azadiyê di dîroka kurdan de gaveke girîng e. Piştî tevgera azadiyê jî mirovê kurd re pelekê paqij vebû. Dekên dagirkeran bêtesir kirin. Mirovê kurd derxistin ser jiyaneke paqij û ji dergûşa Mezopotamyeyê re bû rêbereke mezin.

Di dîroka kurdan de, em tu çarî bi qasî îro xwedî hevîyê mezin nebûne, bi qasî îro me êş nekişandîye û em nêzikî azadiyê nebûne. Tu çarî em negihaştine bawerî û ruhekî mezin. Îro, mirovên kurd, di her alî de piştigiriya tevgera azadiyê dikin û di her alî de çembera dagirkeran şikandîne û dagirker xistinê şaşîyê gelek mezin.

AYDIN TOPAL



Stratejiyêke nû ji peydakirina xwendevanan

SAMÎ TAN

Di hefteyan berî niha di vî quncikî de hatibû daxuyandin ku wê di demeke nêzik de encamên ku ji anketê derketiye pêşkêşî xwendevanên xwe bikin. Di rûpelê şeşemîn ê vê hejmarê de nixandîneke berfireh cih digire. Em dixwazin li vir anketê ji aliyê din ve binirxînin û dîmeneke ku bi hejmaran nayên ziman li ber çavan raxin.

Dema mirov bala xwe dide temenê kesên ku anket bersivandine tê dîtin ku piraniya xwendevanên me di navbera 21-30 salî de ne. Hejmara ciwanan kême, ew jî dide nîşan ku piraniya xwendevanên me mirovên gihîştî ne. Her wiha asta perwerdehiya wan jî vê yekê diselmîne. Lewre jî 126 kesên ku anket bersivandine 49 heb xwendeyên zanîngehê, 32 jî xwendeyên lîseyê ne. Hêjayî gotinê ye ku 3 kes jî qet neçûne dibistanê lê dîsa jî bi kurdî dixwînin. Divê ew yek pozê hinek rewşenbîrên ku pûte bi zimanê kurdî nadin, bi zimanê biyan xebatên xwe dikin bişewitîne.

Li aliyê din piraniya xwendevanên me ji demeke dirêj ve bi kurdî dixwînin, hejmara kesên nû dest bi xwendinê kirine jî 126 kesî bi tenê 12 ye. Dîsa hejmareke mezin a xwendevanên me ji destpêkê he ta niha rojnameyê dixwînin û piraniya

wan jî hemû rûpelan dixwînin.

Dîmena li jorê dide zanîn ku xwendevanên zimanê kurdî gelekî bi serb û tîngî-hîştî ne. Lê aliyê din ê dîmenê ku divê em ji bo peydakirina xwendevanên nû xebatê bikin, lewre hejmara heyî pir hindik e. Ji bo vê yekê jî pêwîstî bi stratejiyêke nû ye, di vî warê de jî bi qasî xebatkarên rojnameyê bar dikeve ser milê xwendevanan jî. Gelo em dikarin çawa pejnariya mirovan di warê zimên de zêde bikin û em bi çî awayî dikarin fêrbûna zimanê kurdî ji bo gel hêsantir bikin? Pîrsa bîngêhîn ev e.

Li gorî encama anketê, piraniya xwendevanên me zimanê rojnameyê hêsan dibînin, lê ew yek pîrsgirêkê çarêser nake, lewre dîsa 126 kesî 20 ango %16 zimanê rojnameyê giran dibînin ku piraniya wan jî nû dest bi xwendinê kirine. Lewre jî divê em li ser zimanê rojnameyê rawestin ji bo kesên ku nû dest bi xwendinê dikin. Her wiha %68'ê xwendevanên me ferhengokê dixwazin, ew yek nîşan dide ku xwendevanên me ji hinek peyv û tîgînan fêm nakin.

Dîsa bersivên ku ji bo zimanê nivîskaran hatine dayîn jî balkêş in, em hevî dikin ewê jî dîtinên xwendevanan li ber çavan bigirin. Li aliyê din divê bê gotin ku zimanê nivîskaran ku xwendevan giran dibînin,

ji aliyê xebatkarên rojnameyê ve jî giran tê dîtin.

Dema mirov dêhna xwe dide bersivên ku ji bo xeta weşanê hatine dayîn, eşkere dibe ku piraniya xwendevanên me xeta weşanê baş dibînin.

Lê birek xwendevan xeta weşanê rexne dikin. Di vir de jî du meyl hene yek ji wan dixwaze li hemberî rejîmê tûjtir bibe, yek jî dibêje bila kesên ji derdorên cuda xwe karibin tê de îfade bikin.

Divê em bibêjin ku Azadiya Welat weşaneke kurdistanî ye, lewre jî rê li ber kesî nehatiye girtin, çî kesê ku dixwaze bi şewazeke baş bîr û ramanên xwe bîne ziman rojname jê re vekirîye. Çawa ku xwendevanên jî bîr û baweriyên cur bi cur in, lê di kêşeya neteweyî de digihîjin hev, em ji nivîskarên jî bîr û baweriyên cuda re jî vekirî ne.

Li aliyê din mirov di pîvana hevalên ku rojnameyêke tûjtir dixwazin nagihîje. Em xwe bi hinek seretayên rojnamegeriyê sînorkirî dibînin, wate rastî çî be divê were gotin, wekî din çî bend qeyd nîn in.

Her çiqas di warê belavkirinê de astengî hebin jî, ji anketê tê fêmkirin ku rojname li gelek bajarên Tirkiyê û bakurê Kurdistanê belav dibe. Herî zêhîf bersiv ji Stenbol, Amed û Edeneyê hatine ew jî se cihên girîng in ji bo kurdan.

Di encamê de pîrsgirêk bi anketê zelaltir xuya bû, edî dimîne çêkirina stratejiyêke nû, pêkanîna guherînên pêwîst li gorî daxwazên xwendevanan.

Silav li berxwedana Licê

HARBI SOYLU

Lice, dayika dîroka me ya nû ye. Dîroka nû ji Licê dest pê dîke. Her çiqas berî avakirina PKK'ê bi rengê fermî li Licê kar û xebateke birdozî û konevanî hebû jî, çarî yeke-mîn rêxistina gelê kurd a herî pêşverû, herî demokrat û herî sosyalîst li Licê hat damezrandin. Yanê Partiya Karêrên Kurdistanê di maleke li gundê Fîsê ku girêdayî Licê ye de tê avakirin. Cihê wiha dîrokî jî bo gelan pir biqîmet in. Deverên wiha, tim jî bo gelan bûne qiblegeh. Heya roja me ya îro jî jî bo gelê me wekî cihê herî muqedes tê nixandî. Îcar pêwîst e ku em jî bi vî çavî li Licê binihêrin. Girîng e ku em Licê tenê nehêlin, mîna çavê xwe biparêzin. Lê îro li Licê çî dibe? Em jî bo Licê dikarin çî bikin?

Çawa me li jor jî got Licê qonaxa destpêka dîroka me ya nû ye. Ji ber vê yekê dijmin dibêje: "Vî karî li ku dest pê kirîye, wê li wir biqede." Dijmin dizane ku Lice cihê berxwedanê ye. Heya niha du, sê çaran gel di qirkirina re derbas kir, lê gel serî danayne. Ji ber vê yekê jî dijmin dixwaze ku Licê bixîne û teslîm bigire.

Dema hêzên şoreşê durûsmekê diavêjin, dijmin jî li hemberî van durûs-

Dayik cerdevaniyê wekî bêşereftiyê dibînin, dizanin ku cerdevanî li hemberî gel xiyamet e û vê xiyametê napejirînin. Ew dizanin ku xiyamet rûşeyêke gelek mezin e. Divê em guh bidin vî dengê Licê, ew dengê welat e.

man eynî durûsman diavêje. Her wekî Serokê neteweyî got: "Emê yan qezenc bikin, yan qezenc bikin." Di dî vî yekê re şerê taybetî jî, bi devê Tansu Çillerê wiha got: "Yan ê biqede, yan ê biqede." Dîsa serleşkerê ARGK'ê Şemdin Sakîk, di hevpeyvînekê de wiha gotibû: "Vî karî li Enqereyê dest pê kir, wê li Enqereyê jî here serî." Îcar îro jî dijmin dibêje: "Vî karî li Licê dest pê kirîye, wê li Licê dawî lê bê." Çawa ku tê zanîn heyra niha tevgera azadiyê çî gotibe pêk aniye. Lê dijmin li ku bikeve tengasiyê, li wir zirtan diavêje.

Dijmin îro dîsa har bûye û dixwaze cerdevaniyê li ser gelê Licê bike ferz. Lê belê gelê Licê li ber xwe dide û cerdevaniyê napejirîne. Dijmin bi darê zorê gel li hev kom dîke, bi îşkenceyê û bi lêdanê dixwaze gel bike cerdevan. Dema vî yekê jî dîke rastiyê ji raya giştî vedîşere û dibêje: "Gel bi xwe dixwaze bibe cerdevan." Lê belê nikare rastiyê veşêre. Rûçikê wan yê reş dîsa wekî her carê derdikeve holê. Bi rastî jî gelê Licê di bin zilmeke gelek mezin de ye. Pêwîst e mirov guh bide berxwe-

dana Licê. Bi piranî jî berxwedana dayikan.

Hem di kanalên TV'yan de hem jî di rojnameyan de berxwedana dayikan bi rengê vekirî hate xuyân. Dayikekê di kanaleke TV'yê de wiha digot: "Min divê ez parsê bikim, lê min navê ku em bibim cerdevan." Diyikekê din jî di rojnameya Demokrasiyê de wiha gotibû: "Bila cenazeyê kurê min were malê, lê bila kurê min bi çeka neyar neyê malê." Gotinê van her du dayikan jî gotinên pir birûmet in.


Dayik cerdevaniyê wek bêşereftiyê dibînin, dizanin ku cerdevanî li hemberî gel xiyamet e û vê xiyametê napejirînin. Ew dizanin ku xiyamet rûşeyêke gelek mezin e.

Îcar ew kesê jî xwe re dibêje "Ez mirov im", pêwîst e guh bide van gotinan û ji bo Licê dengê xwe derxîne. Bi madî û manewî jî destê kê çî tê bila bike. Îro alîkariya ji bo Licê, ji bo hemû Kurdistanê ye. Dengê berxwedana dayikên Licê jî nav dilê welatê. Dengê dayikên Licê dengê mirovatiyê ye. Xîret jî hezkirina welatê!



ASTSUBAY Hüseyn Oğuzê ku endamên Çeteya Gever pirsyar kirine ji Komîsyona Meclîsê ya ji bo Bûyera Susurlukê re diyar kir ku di navbera Yeşil (Mahmut Yıldırım) û Abdullah Çatlı de têkiliya amîrî û memûriyê hebûye.

Amîrê rastîn ê YeşilTuğgeneral Veli Küçük e. Oğuz, da zanîn ku, 'Yeşil', Abdullah Çatlı, Alaattin Kanat bi hev re xebitîne û heke ev zincîr bê taqîpkirin wê bigihîje Mehmet Ağar. Astsubay Oğuz diyar kir ku, Bahtiyar Aydın jî ji aliyê îtîfakaran ve hatiye kuştin. Oğuz, li hinek serokçaxşan wiha got: "Li Başûrê Rojhilat hin eşîrên ku wekî alîgirên dewletê xuya dikin, bazîrganiya narkotîkê dikin."



Li ser navê Komîsyona Girtîgehê a TAYD-DER'ê parêzer Kemal Bilgiç, raporek amade kir û diyar dike ku, li Girtîgeha Nazîlyê 64 dîlên PKK'yî jî ber helwesta kargeriya girtîgehê dest bi greva birçûbûnê kirine.

Di raporê de tê gotin ku, kargeriya girtîgehê nahêle ku hevdîtinên girtî û parêzeran pêk werin û cendîrme gefa kuştinê li girtîyan dikin. Girtîyên ku rewşa wan xerab ev in: Nurettin Anyık, İbrahim Öncü, Nadir Kalkan, Ahmet Sarı, İzzettin Ceyhan, Mehmet Aydın, Melih Demir. Her wiha li Girtîgeha Uşakê jî cendîrme û gardiyanan êrîş birin ser girtîyên jin û girtîyan di 21'ê rêbendana 1997'an de dest bi greva birçûbûnê kirine.

NÛÇE

'Fersenda dewleteke kurdî heye'

Serokê Komîteya Jeopolîtîk a Dûmayê Dewletê A.V. Mitrofanov di konferansa bi navê "Perspektîfa Hevkariya Gelê Rûs û Kurd" de got ku Amerîka û rojavayî wê tu carî nikaribin pirsgirêka kurdî çareser bikin. Mitrofanov diyar kir ku Rûsya mecbûr e roleke girîng bigire ser xwe ji bo çareseriya pirsgirêka kurd û bi bîr xist ku îro fersenda avabûna dewleteke kurdî heye.

Piştî avabûna PKDW'ê çalakiyên diplomatîk ên kurdan berfireh bûn. Ev çalaki, dewleta tirk bi awayekî hem deşîfre dikin û hem jî rê li ber çareseriya siyasî vedibe. Her wiha li Yekîtiya Dewletên Serbixwe (YDS), bi vî mebestê jî aliyê PKDW û ERNK'ê ve pir çalaki û civîn hatin lidarxistin.

Di destpêka salê de jî wekî encama xebatên Berpîrsê ERNK'ê Şaxê YDS û Rojhilata Ewropayê Mahîr Welat, konferansekê bi navê "Perspektîfa Hevkariya Gelê Rûs û Kurd" wê di 16'ê rêbendana 1997'an de bihata lidarxistin. Lê piştî hinek hewlên dewleta tirk û hin hêzên ku jî têkiliyên kurd û rûsan aciz dibin, konferans hatibû taloqkirin.

Ev civîn bi serkêşiya Komîteya Jeopolîtîk a ku girêdayî Parlamentoya Rajêr Dûmayê ye, Yekîtiya Rêxistinên Kurdan a Navneteweyî, Federasyona Hevkarî û Aştiyê ya Rûsyayê û Komîteya Parastina Aştiyê ya YDS'ê, roja 13'ê Reşemîya 1997'an li Moskovayê hate lidarxistin. Hinek endamên Dûmayê jî piştigiriya civînê kirin.

Civîn li ser hevkarîya gelê rûs û kurd bû. Ji bilî parlementerên Dûmayê û Komîteya Jeopolîtîk, nûnerên gelek sazîyan û hinek şexsiyetên navdar jî beşdarî civînê bûn. Di civînê de nûnerê Serkaniya Giştî ya Rûsyayê, nûnerê Rêxistina Karê Saloxiyê (KGB), Wezaretîya Gelên Hindikahî û gelên ku dewletên wan di nav sînorên YDS'ê de tune ne, nûnerê Partiya Komunîst, Partiya Demokasiya Lîberal, Partiya Karkeran, nûnerên ermenîyan, yewnanan, belarûsan, azerîyan û hwd. beşdar bûn. Li aliyê din çapemeniya Rûsyayê eleqeyê baş nişan da.

Di civînê de kesên navdar û politikavanên ku piştigiriyê didine kurdan axivîn. Pêşî Serokê Komîteya Jeopolîtîk a Dûmayê Dewletê Aleksey Valentinoviç Mitrofanov axivî. Mitrofanov bal kişande ser hêzên ku nexwestine konferans di dema xwe de çêbibe û tunebûna politikaya Rûsyayê ya li ser Kurdistanê rexne kir. Mitrofanov got: "Divê em dostaniya gelê kurd û rûs li ser bîngeheke stratejîk xurtir bikin. Ev dostanî li gorî berjewendiyên

her du gelan e. Ji ber vî yekê divê Rûsya rojek berê rojekê politikaya xwe ya Kurdistanê diyar bike."

Mitrofanov li ser helwesta neyînî ya ku Amerîka û dewletên ewrûpî li hemberî kurdan nişan didin jî, ev nirxandin kir: "Amerîka û dewletên rojavayî wê tu carî nikaribin pirsgirêka kurdî li ser bîngeheke heqane çareser bikin. Divê çareserkerîna de Rûsya mecbûr e ku roleke girîng bigire ser xwe. Dibe ku pereyên Ewropîyan û Amerîkayê pir bin, lê tu carî bi qasî Rûsyayê ne nêzîkî pirsgirêka kurdan in."

Wî gotinên xwe bi vî rengî domandin: "Di şerên cihanê yê yekemîn û duyemîn de fersenda dewletbûna kurdan hebû, lê ew fersend jî dest wan çû. Îro ev fersend heye; divê kurd wê jî dest xwe bernedin. Emê jî, ji bo çareserkerîna vî problemê bixebitin."

Siyasetvanê rûsî Mitrofanov da zanîn ku pirsgirêka kurdî pirsgirêkeke sereke ye li Rojhilata Navîn û heta li hemû Rojhilat. Serokê Komîsyona Jeopolîtîk gotinên xwe wiha qedandin: "Em bi tenê nabêjin em jî kurdan fêm dikin û dilê me bi wan dişewite, em bi her awayî amade ne ji bo ku alîkariya kurdan bikin. Ev nêzîkbûn bibe pozîsyona fermî ya Rûsyayê wê di cihanê de guhertinên pir mezin çêbibin"

Nûnerê ERNK'ê Mahîr Welat jî rexneyên xwe yê der barê bêpolitîkabûna Rûsyayê di warê kêşeya kurdî de anî zîman. Welat daxuyand ku bêpolitîkabûna Rûsyayê, li dijî berjewendiyên gelê rûs û kurd e, pirsgirêka kurdan bûye pirsgirêkeke navneteweyî. Mahîr Welat wiha axivî:

"Helbet hinek hêz jî bo ku rê li ber vî konferansê bigirin pir xebitîn, lê bi ser neketin. Berî her kesî divê gelê rûs vî baş bibîne ku fen û fûtên ku li ser kurd û Kurdistanê ku tên kirin, bi destê Tirkiyeyê li ser Kafkasya û Rûsyayê jî tên kirin. Ev politikayên dijminatîyê, divê gelê kurd û rûs nêzîkî hev bikin. Lewma em bangî Rûsyayê dikin ku ji bo çareserkerîna pirsgirêka Kurdistanê bêhtir aktîv be. Heger Rûsya dereng bimîne dibe ku însiyatîf bikeve destê Ewropa û Amerîkayê."

Welat bangêk jî li zanyar, siyasetvan û rêxistinên YDS'ê kir ku giraniya xwe bi-

dine ser dewleta Rûsyayê, da ji bo ku der barê kurdan de politikaya xwe kifş bike. Welat bal kişande ser aşîxwaziya PKK'ê û daxuyand ku ew jî bo çareserkerîna pirsgirêka Kurdistanê hem bi riya aşîyê hem jî bi riya şer amade ne.

Di konferansê de kurdekî 92 salî ku navê wî Kolozê Şero bû û berê alîkarê serrokekî rûs ê bi navê Melotov bûye jî axaftinek kir. Kolozê Şero yê ku 8 zimana dizane û bi sala di nav diplomasiya Sovyetê de cih girtiye ku îro jî berê bêhtir hewce darî bi yekîtiyê û biratiyê gelan heye. Li ser vî bîngehê divê aşîyêke birûmet li Kurdistanê di navbera her du gelan (kurd û tirk) de bê pêkanîn.

Serokê Komîteya Çevdêriyê ya Partiya Komunîst û Endamê Dûmayê yê berê Petrovskî L.N. jî bal kişande ser neheqiyên ku li kurdan tên kirin û bédengiya cihanê. Petrovskî L. N. wiha got: "Ewqas neheqî li gelê kurd dibe, lê dîsa jî gelê kurd bi sebir, riya aşîyê vekirî dihêle. Divê ev zilm li gelê kurd neyê kirin û rê li ber vî neheqiyê were girtin."

Parlemerterê Dûmayê Mironov O. O. li ser aşîyê rawestiya. Mironov xwest ku ji bo çareseriya pirsgirêka kurdan li tecrûbeyê Rûsya û Çeçenistanê bê nihartin. Mironov da diyar kir ku mafê kurdan bi tenê nayê maneya dewleteke serbixwe; bi riya dewleteke federalî jî ev pirsgirêkê çareserkin. Mironov got ku divê jî Tirkiyeyê riya çareseriya aşîyê bê xwestin, şerê mezî jî bo her du gelan jî trajedî ye.

Cîgirê Serokê Federasyona Aştiyê û Lihevhatinê, Akademîsyen Îsayêv M. Î. jî di konferansê de axivî û li ser bêpolitîkabûna Rûsyayê sekinî û daxuyand ku divê Rûsya rola xwe ya çareserkerîna bilîze. Li gorî Îsayêv nebûna vî politikayê berjewendiyên gelê rûs û kurd dixwe xeterreyê.

Serokê Fonda Yekîtiya Gelên Rûsyayê ya Ruhî, Akademîsyen Trapezniçkov G. Y. jî politikaya Tirkiyeyê ya Panturkîzmê destnîşan kir û xwest ku xeteriya vî politikayê jî bo gelên cîran baş bê ditin. Divê gelên cîran û Rûsya nehêlin ku Tirkiye bigihîje armancên xwe.

Dîrokzan Profesora Lazarêv M. S. jî li ser politikaya îdeolojîk a Rûsyayê sekinî. Diyar kir ku Rûsyayê her tim bi çavekî îdeolojîk nêzîkî serhildanên kurdan ên berê bûye, ew serhildan feodal dîtine, ji ber vî jî wê politikayê xesareke mezin daye tevgerên kurdan ên azadîxwaz. Ev politîka îro jî bandora xwe didomîne.

Akademîsyen û parlementerê Rûsyayê yê berê Lûkava G.G. li ser domandina



PROF. M. S. LAZAREV

şerê Kurdistanê sekinî. Lûkava diyar kir ku heke Amerîka û Ewropa nebe Tirkiye nikare şerê li Kurdistanê bidomîne. Divê Rûsya hevalbendiya Tirkiyeyê neke, piştigiriya kurdan bike.

Di encama konferansê de, biryareke ji du xalan pêkhatî derket:

- 1) Ji bo çêkirina politikaya Rûsyayê der barê Kurdistanê de avakirina komîsyonekê.
- 2) Ji bo ku ew çekan nefiroşe Tirkiyeyê bangî li hikûmeta Rûsyayê hate kirin.

Konferansa duyemîn jî dest pê kir

Konferansekê din jî bi navê 'Li ser pirsgirêkn etnik û nav gelan dîtinên navneteweyî' jî roja 20 reşemiyê dest pê kir. Di vî konferansê de jî parlementer û nûnerên wekî Ukranya, Kırım, Bulgarîstan, Kîbrîs, Azarbeycan, Ermenîstan, Gûrcîstan, Kazakîstan, Özbekîstanê jî wekî guhdarvan beşdarî konferansê bûne. Endamê PKDW'ê Necdet Buldan axvînek kiriye. Pîranî li ser aşîya hatiya rawestîn. Li aliyê din serokê Enstîtûya Hiqûka Navnetewî Prof Bîleşençko û Serokê Enstîtûya Hiqûkê ya Afrîka û Asyayê Şonîn jî yak axaftin kirine. Li gorî agahiyan ev konferans jî wê heta roja 23 reşemiyê bidome. Dêrdorê siyasî jî vî konferansê jî bo çareseriya pirsgirêka kurdî gaveke girîn dinirxînin. Zêdebûna eleqeya çapemeniya Navnetewî bala otorîteyê siyasî kişadiye ser konferansê.

İBRAHİM XORT/MOSKOVA
M. AKSOY

Keştiya tirkan noq dibe

Ev nivîs ji aliyê Tora Agahiyê, ya Kurdên Amerîkayê (AKIN) ve, di 19'ê rezbera 1995'an de wekî teblîxekê ji civîna bi navê "Turkey-U.S. Relations: Potential and Peril (Têkiliyên Tirkîye û Amerîkayê: Potensiyel û Astengî) re hate pêşkêşkirin. Civîn ji aliyê Komîsyona Hevkarî û Ewlehiyê ya Ewrûpayê ve li Kongreya Amerîkayê hatibû lidarxistin. Ev teblîx ji aliyê SAMÎ BERBANG ve ji Îngilizî hate wergerandin.

Trajedyên daxuyandî û danexuyandî li cihên wekî Rwanda, Bosna, Kurdistan û Tîmora Rojhilat nîşan didin ku çawa hestiyê stûyê şaristaniyê bi hêsanî tê şikênanandin. Hin caran dexesî, hin caran nîjadperestî nahêle ku mirov vê cîhanê ji bo hemû mirovan bikin cihekî baştir.

Diyardeyeke ku li hemberî van guherînên bi xurtî li ber xwe dide û bi vê yekê jî me şaşwaz dihêle, têkiliyên Tirkîye û Amerîkayê yên bi rengê Serdema Şerê Sar in. Enqere bi pîkolî dixwaze van têkiliyan bide meşandin, ji ber ew ku bi dilê wê ne. Tirkîye îdia dike ku li bakurê wê tiştek neguheriyê û tehdîten mezintir li Rojhilat (wekî Îranê) û li Başûrê Rojhilat (wekî şerê kurdan) peyda bûne. Dewletên Yekbûyî yê Amerîkayê (DYA) jî wisa dide zanîn ku ew vî mantiqî dipejirîne û berjewendiyên xwe dixwe nava xeterê. Wekî hinek mirov dibêjin "Yên di nav mij û dûmanê de" tê negihîştine ku tehdîta Sovyetê ji holê rabûye.

Li gorî baweriyaya me ev polîtîkaya neguherî, îstîkrara Tirkîyeyê dixwe nava talûkeyê û berjewendiyên Amerîkayê tehdît dike. Pirsgirêk û meseleya kurdî ye ku her şev di nûçeyên televîzyonên tirkan de mijara sereke ye, jê re çareseriyê medenî divê, lê heta niha bi tenê çareseriyê leşkerî wekî bersiv jê re hatîye dayîn. Ev şêwe nêzikîtdan ne tiştekî nû ye li Tirkîyeyê. Îro tiştê nû ev e ku li hemberî Tirkîyeyê berxwedanekê rêxistî ya tevgerê girseyî heye û êdî ji sînorê paşçavkirinê boriye.

Nihêrîneke lezgîn a li binyada meseleyê wê hinek rastiyên ku serê mirov tevîhev bike, derxe holê. Kurdên ku pêşî di sala 1514'an de di navbera tirk û farisan de dabeş bûn, bi piranî li ser çiyayên xwe jiyîn, heta sala 1923'an guhên xwe nedan çerxa dinyayê. Lê mirov kare bi hesanî bibêje, ew jî dilên Împaratoriya osmanî û farisan ên temendirêj bûn û wekî hemû dilên din ji destê wan kişandin, bûn hevparê gelek kirinên rûmetşikên. Lê tiştê jî bo vê gotarê girîng ev e, warê wan Kurdistan û zimanê wan kurdî giramgirî lê hat kirin û ne zehf be jî di mercên serbest de gihîştin dema niha.


Amerîka jî pê re

Komara tirkan a ku ji riçên împaratoriya osmanî peyda bû, di destpêkê de soza nasîna hemû mafên kurdan da. Mustafa Kemal û generalên ku ji bo rizgarkirina bermayiyên osmaniyan, xwest kurd bi tirkan re bibin yek, der barê yekparetiya dewletê de (ya ku paşê M. Kemal ji xwe re kir prensîb û heta roja îro jî peyrewên wî diparêzin) tiştek negotin. Wan dizanibû ku mafê çarenûsiya kurdan di Peymana Sevrê ya sala 1920'î de cih digire, lê di sa bi kurdan dan bawerkirin ku yekîtiya du gelên misilman; yanê yekîtiya tirk û kurdan, ji hevallbendiya kurdan a bi rojavayîyan re baştir e. Şerê rizgariyê yê kurd û tirkan ku 4 salî dewam kir, rê li ber avabûna Tirkîyeyê vekir. Di peymanê 1923'yan de M. Kemal li parastina destkeftiyên xwe geriya. Li wir wekî ku peyrewên wî jî îro dikin, rabû qasidekî kurd İsmet İnönü ji bo gotûbêjan şand Lozanê. İnönü ji nûnerên Îngilîzan re got ku kurd tu mafên taybet naxwazin û di bin sîwana komara tirk de bextewar in. Ji bo ku ingilîzan bi vê yekê bide bawerkirin, def dabû nûnerên kurd da ku telgrafan bişînin ji konferansê re û diyar bikin ku ew yekîtiya bi tirkan re dixwazin.

Peymana Lozanê di 24'ê tîrmeha 1923'an de parçebûna erdê kurdan di nav 5 dewletan de testîq kir. Tirkîye ji wan dewletan a herî bi kar bû ji ber ku %43'yê erdê kurdan xistibû bin destê xwe. Îran, Iraq, Sûriye û Yekîtiya Sovyetê bi rêjeyên wekî %31, %18, %6 û %2 Kurdistan li hev parve kiribûn. Niha gelekî dijwar e ku mirov nifûsa kurdan a di bin hukmê wan dewletan de tesbît bike, ji ber ku ew dewlet an hebûna kurdan înkâr dikin an jî hejmarên ji rastiyê dûr didin. Nifûsa kurdan a ne fermî ji 25 milyonî heta 40 milyonî diguhere û 15-20 milyon kurd li Tirkîyeyê dijîn.

Piştî Peymana Lozanê jiyana kurdan ji dema osmaniyan xerabtir bû. Hema piştî peymanê, Atatürk hemû sozên ku dabûn kurdan danîn aliyekî, dest bi meşandina fikra yekîtiya dewleta tirk, hebûna yek gelî ango tirkan kir. Gotinên wî yê wekî "Tirkîye ya tirkan e" bûn dogmayên resmî û hê jî bingeha netewperestiya tirkan pêk tinin. Heta îro jî di qanûna bingehîn a tirkan de xala yekemîn ev e: "Dewleta tirkan bi erd û gelê xwe yek e û parçe nabe. Ev xal nayê guhartin, heta pêşniyaza guhartina vê yekê jî nabe." Li gorî qanûna bingehîn a tirkan, mafên gelê Anatoliyê, çi kurd, çi yewnan, çi ermen dema tirkbûnê bipejirînin heye, ji ber ku Atatürk wisa diyar kirîye.

Di salên 1950'yî de yewnanî bi awayekî sistematîk ji warê xwe hatin qewitandin; hin caran bi darê zorê, hin caran jî bi kirinên provokatîf ku ew neçar dihiştin da ku her tiştê xwe li pey xwe bi-



hêlin û birevin.

Dengê ermeniyan bi tevkujiya 1915'yan de hate birîn. Hitler ev bûyer ji xwe re kir mînak û piştî 20 salî bi eynî rengî wî jî cihû kuştin. Rewşa kurdan hinekî cihêreng e; hejmara wan gelek bû û piraniya wan jî wekî tirkan misilman bûn. Hêzeke pir mezin pêwîst bû ji bo tunekirina wan. Tevdîrîn û planên dûr û dirêj ji bo wî karê hatin gerandin. Çare di pişaftina bi darê zorê de hate dîtin. Di nava salekê, du salan de endazyarên tirk dixwazin hemû tiştên ku qala kurdan dikin ji holê rakin. Di sala 1924'an de dest pê kirin û navê kurdan qedexe kirin.

Pişt re qanûna ku rayeyê dide rayedarên da ku karibin hemû navê bi kurdî biguherînin, derxistin. Di carekê de hemû gund, navçe, bajar, heta bigihe mezrayan hemû navên bi kurdî cihê xwe ji yê bi tirkî re hiştin. Wekî mînak di nexşeyên ku wexta serweriya osmaniyan hatibûn amadekirin de, navê kurdan derbas dibû û herêma ku ew lê dijîn jî wekî Kurdistan dihate binavkirin. Di nexşeyên komara nû de, objektîfiya zanistî danîn aliyekî û hemû herêm wekî Tirkîye hatin binavkirin.

Wekî ku dihat hêvîkirin kurd li hemberî vê fermana mirina xwe bédeng neman. Bi mebesta betalkirina hukmê wan qanûnan rabûn ser piyan. Demeke dirêj

berî biryara 3103'yan a Neteweyên Yekbûyî kû li hemberî têkoşîna rizgariyê bikaranîna hêzê qedexe dike, kurdan gelek carî (wekî rapêrînen 1925, 1930 û 1938'an) ji bo çarenûsa xwe dest birin xwe. Lê heta sala 1980'yan hemû rapêrînen wan têk çûn, serokên kurdan ên navdar hatin daleqandin û lêzîmên wan hatin nefîkirin.

Wekî ku têkçûna di bîra mirovan de ne bes be, hemû zinarên ku ji dûr ve xuya dikin, bi nivîsên wekî "Xwezî bi kesên ku ji xwe re dibêjin tirk" hatin neqîşandin. Heke psikoterapîst bala xwe bidin vê yekê, wê teşhîsa nexweşiyê kompleksa xwemezindîtîne li tirkan bikin. Li tu derên din rûxandina derdor û kesayetiya mirovan bi vî rengî nayê dîtin. Heke bi van kirinan armanca dewleta tirk, bi kurdan danhezkirina tirkan be, berêvajîya wê pêk hat. Kurdan li ber xwe da, lê tirkan xwestin bi darê zorê van qanûnên nîjadperestî ku Atatürk û hevalbendên wî derxistibûn bi kurdan bidin pejirandin.

Îro hinekî mesele gihîştîye radeya li-berxwedanekê girseyî ku bi pêşengiyê baskê çekdar a PKK'ê Artêşa Rizgariya Gelê Kurdîtanê (ARGK) tê meşandin. Ji bo kurdan ev şer bûye şerê hebûn û nebûnê, li aliyê dewleta tirkan jî bûye

şerê parastina prensîbên nijadperest ên ku Atatürk danîne.

Gelek rapor û belgên ku buhayê têkoşîna rizgariyê ya kurdan diyar dikin, hene. Yek ji van belgayan di sala 1994'an de ji aliyê Weqfa Mafên Mirovan ve bi navê "Dosyayên kuştinên di binçav de an jî li girtîgehên" hatiye amadekirin. Ew navê 420 girtiyên siyasî li pey hev rêz dike. Bi berfirehbûna şer hinek raporên din jî rûdan. Derya Sazak di hejmarê 25'ê tîrmehê ya Milliyetê de cih dide gotinên waliyê herêma rêveberiya ne-asayî ya ku rûxandina 2665 gundî dipejirîne. Ev hejmar, îstatîstîke fermî ye. Bi milyonan gundiyan jî cihê xwe bûyî, çûne li guhê bajaran, di konan de birçî û betal dijîn, bi girekî mezin li hemberî sisteme sekinîne.

Di nava vê rewşa xerab de dostên têkoşîna rizgariya kurdan nîn in. Rêveberiya Washingtonê bi vê pevçûnê ne hêzêke alînegir e jî, Amerîka di şer de piştgiriyeke eşkere daye Tirkîyeyê. Ji Enstîtuya Siyaseta Cîhanê Jennifer Washburnê li ser tîkiliyên Tirkîye û Amerîkayê di rojnameya Louis Post Dispatchê de wiha dibêje: "Ji sala 1984'an ku şerê PKK'ê û Tirkîyeyê dest pê kiriyê bi vir de, Amerîkayê jî bi çekên ku dane Tirkîyeyê ev şer gur kiriyê. Amerîkayê heta niha bi hejmayî 6.3 milyar dolarî çek firotine vî welaî ku di bin rêveberiya leşkeran de li hemberî kurdan êrişên terorîst pêk tîne. Bi tenê di navbera salên 1987 û 1991'ê de Tirkîyeyê %76'ê çekên ku ji derve distîne, ji Amerîkayê kirîne. Di navbera salên 1991 û 1993'yan de ku şer gurtir û bîpêkirina mafên mirovan zêdetir bûye, ev rêje jî bûye %80."

Di tirkî de gotinek heye dibe ku ji bo peywendiyên Amerîka û Tirkîyeyê ronîker be. Tirk dibêjin: "Dema tu tevşoyekî bidî destê yekî/ê wê li ber çavê wê/wî mîx bibin sedema hemû gelemşayan." Amerîkayê tevşo daye destê Tirkîyeyê

ku ew jî pê li serê kurdan dixê. Xuya ye ku ev tişt dibe sedema pêldana gira li dijî Amerîkayê (di nav kurdan de). Ew dibînin ku heke ne bi alîkariya Amerîkayê bûya, Tirkîyeyê nikaribû vî şerê qirêjî li hemberî kurdan bimeşîne.

Domandina vê polîtîkayê ji ber gelek sedeman li berjewandiyên Amerîkayê jî nayê û zû yan dereng wê lê vegere. Wekî Tirkîye îdia dike, ne bi tenê komek kurd, lê hemû kurd zirarê ji çekên Amerîkayê dibînin. Heke Amerîka dixwaze li Enqereyê jî rê li ber hilweşîneke giştî bigire, pêwîst e tavilê van tîkiliyên di bin

navê xwe bi qîmet bike, divê ew xwe ji îdeolojiya kemalîst a faşîst dûr bixe û nîrxên demokrasî, mirovahî û zagonên zanîstê nas bike. Wekî destpêk divê zagona bîngêhîn a bêmantiq biguherîne û hebûna kurdan bipejirîne. Wê Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê jî ji vê gavê sûtê bistîne, wê aştî û aramî were ser erdê Tirkîyeyê.

2) Amerîka divê bixwaze ku Tirkîye li şûna ku bikeve riya piştewaniya tundrewiya îslamî, bikeve riya demokratîk û gotûbêjan ji bo çareserkirina gelemşeya kurdan. (...)

Hikûmeta Amerîkayê divê ji bo ku gotûbêj di navbera hikûmeta tirk û nûnerên kurdan de çêbin, cesaretê bide her du aliyên. Di vê riyê de naskirina Parlamentoya Kurdistanê ya li Derveyî Welêt (PKDW) wê bibe gaveke girîng. Vê parlamentoyê daxwaza xwe ya ji bo çareseriyeke siyasî ji gelşaya kurdî re wekî terciheke neguherbar diyar kiriyê.

xizmeta armançên şer de, ji nû ve binirxîne. Çend generalên tirk ku di Lijneya Ewlehiya Dewletê (MGK) de ji xwe re cih veqetandine, Tirkîyeyê ber bi felaketê ve dibin.

Ji bo ku tîkiliyên Tirkîye û Amerîkayê têkevin rîyeke baştir, em li jêr çend pêşniyazên xwe rêz dikin.

1) Hikûmeta Amerîkayê divê ji Tirkîyeyê bixwaze ku guherîna esasî di qanûna xwe ya bîngêhîn de bike û mafên demokratîk-siyasî yên kurdan binase. Tirkîye dibêje ku ew dixwaze şer bisekinîne, lê guftûgoyên li ser daxwazên gelê kurd ji bo pêkhatina çareseriya siyasî red dike. Wekî ku mirov bixwaze beryê destdayîna aliyekî problemê, problemeke matematîkê, çareser bike, ev rewşa dişibe vê yekê. Her wekî matematîkê, di polîtîkayê de jî pêkhatina tiştêkî wisa negengaz e. Heke hikûmeta tirk dixwaze

3) Hikûmeta Amerîkayê divê ji bo ku gotûbêj di navbera hikûmeta tirk û nûnerên kurdan de çêbin, cesaretê bide her du aliyên. Di vê riyê de naskirina Parlamentoya Kurdistanê ya li Derveyî Welêt (PKDW) wê bibe gaveke girîng. Li Tirkîyeyê hebûna kurdan rastiyeke jiyane ye, dema nûnerên wan ên di parlamentoya tirkan de di berfanbara 1994'an de hatin girtin, wan bi avakirina PKDW'ê bersiv dan vê kirinê. Vê parlamentoyê daxwaza xwe ya ji bo çareseriyeke siyasî ji gelşaya kurdî re wekî terciheke neguherbar diyar kir. Wê li gorî berjewendiyên Amerîkayê be jî heke hikûmeta amerîkî PKDW'ê wekî merciyekî ku dewleta tirk kare pê re têkeve gotûbêjan, bibîne. Gaveke bi vî rengî wê cesaretê bide kurdan ku ji bo dîtina çareya demokratîk û aştîyane gelek rê ceribandine, lê li hemberî xwe ji bilî êriş û pêkutiyên ji destê dew-

leta tirk, tu tişt nedîtine.

Wekî filozof jî dixwaze bibêje kurdên Tirkîyeyê di ramanên xwe de xwe azad kirine, çiqas zêde li wan zilm bibe jî bi kêr nayê da ku kurd dev mafên xwe yên siruştî (ku ji bo jiyaneke birûmet pêwîst in) berdin. Lê partiya herî mîltan a kurdan PKK'ê jî gelek caran daye zanîn ku ew dikarin dev ji Kurdistaneke serbixwe berdin û meseleyê ji hemû aliyên ve li ser masayê guftûgo bikin. Dîsa diyar kirine ku modela herî bikêr ji bo çareyê federasyoneke demokratîk a kurd û tirkan e.

Serokê Guştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan di 17'ê adara 1993'yan û dîsa di 25'ê gulana 1995'an de diyar kir ku ew dixwazin dawiyê li vî şerî binin. Ew gotin li hemberî çapemeniyê hatin û li kasetan hatin tomar kirin jî, lê rêveberiya Enqereyê dîsa ev deng nebir xwe.

Li gorî dîrokzanan kesê rêzan dikarin arîşeyên li ber xwe zû bibînin û zinarên li ber keştiya dewletê paqij dikin. Hikûmeta tirk red dike ku prolemê bibîne, ji ber ku artêşa tirk rê nade vê yekê. Gelek piştgirên wan jî hene ku riya destavêtina karên bîngêhîn ên siyasetvanan ji wan re vekin. Ji ber ku her roj zêdetir ji rojbilat, tîr rojava Tirkîyeyê.


Binêrin li vê qerfa dîrokê, Serokê Amerîkayê Bill Clintonê ku nexwest têkeve nav refê artêşê ji ber ku Şerê Vietnamê neheq dîtibû, niha rûxandina bi hezaran gundên kurdan, penaberbûna bi milyonan gundiyan kurd pêwîst dibîne.

Bîst salî berî niha maceraya Vietnamê xebe. Bû, ji lew re protestoya Clinton jî di cih de bû. Îro jî şerê li Kurdistanê dîsa çewt e, lê Serok Bill Clinton polîtîkayêke ku ji aliyê mafên mirovan ve yekser xebe e dimeşîne. Em hêvî dikin wê Bill Clinton di demeke kurt de ji bo xatirê mirovahiyê vê çewtiyê rast bike.

Tora Agahiyê ya Kurdên Amerîkayê (AKJN)

Hevalên li Ewrûpayê

HELİM YÜSIV



Namêyên hevalan ên ku ji derveyî welêt tîr, carinan kenê mirov tînin, carinan jî xwezîya mirov di ber mirov de dihêlin. Her çar mehên pêşî gazin û bêrikirin û hawar hawar e, piştr ne name, ne jî telefon namînin. Nema deng ji wan tê. Em jî -yên ku Xwedê ji wan re xera kiriyê û mane li hundir- bi qutkirina nameyan, em tîdigihîjin ku bi cih bûne û nema bêriya tu kesî dikin.

Tu dibêjî qey dikevin rêza miriyan. Bi dilekî şikestî ramanên mirov germ dibin, gelo di tengasiyê tenê de mirov li hevalê xwe dipirse? Gelo ev he. altî ye yan tiştêkî din e? Ev ne gazin e ji tu kesî, na, lê tiştê balkêş ew e ku her kesê diçe xerîbiyê bi vî rengî ye. Piştî re jî ji dost û hevalên xwe re dibêjin: "Neyên, mesele zehmet bûye, berê xweştir bû, xerîbî nex weş e... Û ew bi xwe bi kêfa xwe û bi riyên qedexe

çûne derve û pîrên wan dikarin vegehin jî lê ne vedigerin û ne jî dixwazin vegehin. Mirov bi xwe nikare bibe li dijî derketina her kesî û li dijî jiyaneke xweştir ji her kesî re, lê çetîn e ku mirov durû û sêrûbûna hinekan ji van kesan bipejirîne, ji bilî guhertinên bêhempa û ecêb di raman û kirinên wan de.

Hevalekî me, helbestvan bû, bi zimanê erebî dinivîsand û dema pîrsa kurdîyê dibû digot, "Ez mirov im, ez enternasyon-al im", gava dibû pîrsa kurdan digot "Kurdmanc wilo ne û kurmancan wilo kir." Tu carî li xwe danetanî ku bigota em kurd wilo, yan wilo ne. Mêrik nûnerê mirovayetiye tenê bû. Piştî ku leşkeriya dewletê kûta kir, xwest ku derkeve Ewrûpayê, çimkî Ewrûpa welatê azadî û xweşiyê ye û li wir helbestên xwe yên bombekirî li ser kêfa xwe wê biteqîne û ji ber ku gelêkî bi mirovayetiye ve girêdayî bû; tim mîna hemû komunistên Sûrî, li ser Filistin û Başûrê Libnanê û Nikaragua û Mozambîqê hêsi- û helbest dibarandin, lê dema karê xwe û derketina Ewrûpayê kir, ji nişka ve bû kurd lawê kurdan, li Ewrûpayê jî nema, ji bilî Kurdistanê tu

tişt dihat bîra wî, ez jî niha mat dimînim, dema ez helbestên wî dxwînim, ez ji xwe dipirsim, gelo ev kurdîyatiya wisa ji nişka ve jê re ji ku hat, çawa wisa hestên wî yên neteweyî li Ewrûpayê pîjiqîn? Hetanî ku di nav me de bû, hew mirov tenê bû, ev ji hêla babetên helbestên wî ve. Lê ji hêla teknîkî ve helbest qelstir in ji yên berê û dike nake Ewrûpayê wî nake helbestvanekî enternasyon-al. Nîmûneyên mîna vî hevalî di nav me de pir in, bi dehan berê xwe didin derveyî welêt, di bin siya vê ramanê de, ku li derve wê bibin stûnên girîng di tore û çanda kurdî de. Lê mixabin mîna mûmên erzan, zû vedimirin û nema pêjn ji wan tê.

Ez dibêjim, problem ne di cih de ye, tevî ku cih gelekî girîng e û rola wî xurt e di pêşxistin, an jî paşxistina nivîsaran de. Lê eger problem hebe, berî her tiştî, wê di mirov bi xwe de be, wê di hundirê wî de be û tu carî nebûye şert ku cihekî xweş mirovekî xweşik çêbike, yan jî cihekî ne xweş- wekî welatê me- mirovekî ne xweşik çêbike, mirov bi xwe, an cihê xwe xweş û xweşik dike an jî cihê xwe wêran dike û dike kavil.

Encama anketa me

Wekî ku tê bîra gelek xwendevanên di hejmara 45'an a Azadiya Welat, rûpel 6 de anketek hatibû weşandin, ji bo bê zanîn ka xwendevanên Azadiya Welat rojnâmeke çawa dixwazin. Ev anket 4 hefteyan li ser hev yanê heta hejmara 48'an, di heman rûpelê rojnâmeke de hate weşandin.

Me hêvî dikir ku em nirxandina encama anketê bigihînin hejmara xwe ya 52'yan û piştî wê jî li gorî daxwazên xwendevanan hin guherînan di rojnâmeke de pêk bînin, lê mixabin guherîna karê me rê neda ku ew tişt di wextê xwe de pêk were. Hinekî bi derengî be jî, em encama anketê pêşkêşî we dikin.

Berî ku em dest bi nirxandina encamên ku ji anketê derketine bikin, divê em li ser metoda nirxandinê hin tiştan bibêjin. Em nikarin bibêjin ku anket bi awayekî pisporane hatiye nirxandin. Dîsa Xuya ye ku daxwazên xwendevanan ji sedî sed ji bersivên vê anketê dernakevin. Lewre 3-4 hezar xwendevanên me hene, lê bi tenê 126 anket hatine ji me re.

Li aliyê din di amadebûna anketê de jî hinek alozî hene. Gelek pirs hatine kirin, lê li ser awayê nirxandina wan zêde nehatiye fikirin. Ev jî kêmasiya me ye û ji bêtecrûbetiya me tê. Her wiha tê zanîn ku êdî weşanên xelkê vî karî bi xwe nakin, lê bi kesên pispor didin kirin, lewre jî encamên ku jê derdikevin zêdetir nêzî rastiyê ne, heke ew li gorî berjewendiyên xwe pê nelîzin. Lê derfetên me nîn in ku em vî karî bispêrin kesên ku bi awayekî profesyonelî dixebitin, lewre jî em mecbûr in vî karî jî bidin ser milên xwe.

Di gel van egerên ku me da xuyakirin jî, heta ji me hat, me nirxandina xwe li gorî rêz û rêbazên zanistî pêk anî. Lewma jî em dikarin bibêjin dîme-neke pîr-hindik nêzî rastiyê derket holê.

Êdî em dikarin derbasî nirxandina xwe bibin. Anket bi pîrsa li ser temenê xwendevanan dest pê dike. Li gorî bersivên ku hatine dayîn, ji 126 xwendevanên me, 22 kes ji wan di navbera temenê 15-20 salî de ne. Dema mirov li rêjeyê dixê tê dîtî ku %18'ê xwendevanên me di vî temenî de ne. Ligel vê jî 126 kesên ku bersiv dane pîrsên anketê 88 heb di navbera 21-30 salî de ne, ew jî dike % 70. Hejmara hindiktirîn jî a kesên di ser 40'î re ne. Hejmara wan 16 ye û ew jî beramberî % 12'î ye.

Dîmena asta perwerdehiyê ya xwendevanên me jî bi vî rengî ye: Ji 126'an 49 heb xwendeyên zanîngehê (unîversîte), 32 xwendeyên dibistana amadehî (lîse), 29 kes xwendeyên dibistana seretayî (dibistana ewil) û 10 kes jî xwendeyên dibistana navincî ne. Sê xwendevanên me jî neçûne dibistanê, lê xwe bi xwe hînî xwendina bi kurdî bû-

ne. Rêjeya asta perwerdehiyê ya xwendevanên me: Zanîngeh %41, amadehî %26, seretayî %23, navincî %8 û nexwende jî % 2. Li vir divê bê gotin ku hin kes ji wan hê xwendekar in.

Ji aliyê kar û pişeyê xwe ve jî em li ser rewşa xwendevanên rawestî. Piraniya xwendevanên karê serbest dikin ku di nav de pişeyên wekî parêzer (abûqat), bijîşk (doktor), endezyar (muhendîs) jî cih digirin; hejmara wan jî 126 kesan 37 e. Piştî van 26 heb karmend, 21 heb karker, 20 heb xwendekar, 7 heb girtî, 6 heb esnaf, 6 jî betal hene di nava xwendevanên me de.

Her wekî tê texmînkirin, piraniya xwendevanên me wekî zimanê biyan ê ku dizanin tirkî dane xuyakirin. Ji 126 kesan 115 bi tirkî, 20 bi îngilîzî, 17 bi erebî, 5 bi almanî, 4 bi frensî û 2 kes jî bi farisî dizanin. Piraniya kesên ku bersiv dane anketa me, li Stenbol (19), Amed (19) û Edeneyê (18) rûdînin. Li pey van bajarên jî Êlih, Mêrsîn, Enqere, Tarsûs, Ruha, Wan, Dilok, Bazîd, Îskenderûn, Mêrdîn tê.

Xwendevanên me ji bilî Azadiya Welat % 82 Demokrasiyê, % 53 Özgür Halkê û % 26 jî Jiyan Rewşenê dixwînin. Wekî din ji 126 kesan 17 kes Yeni Yüzyılê, 13 kes Nûbiharê, 13 kes Yurtsever Gençlikê, 7 kes Nûrojê, 4 kes Armancê, 4 kes Hêviyê, 3 kes Zendê dixwînin. Her wiha weşanên mîna Radikal, Emek, Leman, Yurtsever Emekçiler, Bilim Teknik, Bilim ve Ütopya, Middle East, Nûdem, Serxwebûn, Avaşîn, Roza, Akit, Vahdet, Aktüel, Sabah Nûdem, Kızılbaşrak tene xwendin.

Rewşa xwendina bi kurdî

Hejmara mezîna a xwendevanên me, ji destpêka Welat û bi vir de rojnâmeke dixwînin, %60'ê xwendevanên me zêdetirî 5 salan e ku bi kurdî dixwînin, li dora %30'î jî zêdetirî salekê ye ku bi kurdî dixwînin. Rêjeya kesên ku nû dest bi xwendinê kirine jî %11 e. Her wiha %76'ê xwendevanên me ji destpêkê heta niha Azadiya Welat dixwînin. Ji 126 xwendevanan 98 heb hemû rûpelên rojnâmeke dixwînin, hinek jî bi tenê nivîsên bi kurdî an jî kurmanciya jêr naxwînin. Piraniya xwendevanên me ji bayiyên rojnâmeke distînin ku rêjeya wan %60 e. Li aliyê din rêjeya kesên ku rojnâmeke jî cihêkî din temîn dikin %26 e. Hêjayî gotinê ye ku piraniya xwendevanên me serê xwe.

Nirxandina li ser zimanê nivîskaran

Nivîskar	sivik	giran
Celalettin Yöyler	6	6
Amed Tigrîs	47	2
Lerzan Jandîl	2	2
Jan Dost	6	2
Medenî Ferho	1	45
Mîrhem Yiğit	8	37
Şükrü Gülmüş	17	1
Dilbixwîn Dara	56	2
Helim Yüsvî	2	
Faysal Dağlı	8	6
Melik Fîrat	16	
Mazhar Günbat	2	1

rojnâmeke naxwînin. Li gorî encama anketê jî 126 kesan 53 kes diyar ku tevî wan zêdetirî 4 kesên din ji rojnâmeke îstîfade dikin. Her wiha 40 kes jî didin zanîn ku ji bilî wan 2-3 kes rojnâmeke dixwînin. Ji 126 kesî tenê 21 kesê rojnâmeke bi serê xwe dixwîne.

Der barê hêsan an jî giranbûna zimanê rojnâmeke de rewş ev e: Ji 126 xwendevanên me 106 zimanê rojnâmeke hêsan dibînin, 20 kes jî zimanê wê giran dibînin. Li gorî dîtinê 80 xwendevanî zimanê rojnâmeke kurdistanî ye, 38 xwendevanên me jî zimanê rojnâmeke herêmkî dibînin; lê ew li ser herêman li hev nakin, zimanê rojnâmeke hinek botanî, hinek serhedî, hinek amedkî bi nav dikin. Li gorî hinekan jî zimanê Azadiya Welat zimanekî çêkirî ye.

Ji 126 xwendevanan 75 kes xeta weşana rojnâmeke baş dibînin. Li aliyê din 24 kes xeta weşana naecibînin, hinek jî van dibêjin bila zêdetir neteweyî be, hinek jî dixwazin rojnâmeke radikaltir bibe.

Rewşa xwendin û nivîsandina bi zaravayên kurdî wiha ye: xwendevanên me %80 bi kurmancî dixwînin, % 60 jî pê dinivîsin. Xwendevanên me %26 kirdkî (dimilî) fêhm dikin, %19 dixwînin, lê bi tenê %7 bi vî zaravayê me dinivîsin. Dîsa %21'ê xwendevanên me ji soranî fêhm dikin, %14'ê van nivîsên bi soranî dixwînin û %2 bi soranî dinivîsin.

Wekî encam em dikarin derbasî daxwaz û pêşniyazên xwendevanên xwe bibin. Piraniya xwendevanên me dixwazin nivîsên Ali Fîrat (29), Abdurrahman Dürre (23), Yaşar Kaya (23), M. Can Yüce (19), Melik Fîrat (19), Hatip Dicle (13) di quncikên rojnâmeke de bibînin. Ji bilî van F. Hüsên Sağnîç (10), Felat Dilgeç (7), Zübeyir Aydar (6), Mehmet Uzun (6), Leyla Zana (4), Malmisaniy (4) û İsmail Beşikçi (4) jî hinek xwendevanên me ve tînin xwestin.


Digel vê, di nav kesên tînin xwestin de, Yalçın Küçük, Fakik Bulut, Selahattin Çelik, Gülşah Dündar, Yaşar Kemal, Günay Aslan, Hasan Kaya, Abdullah Keskin, Şerif Wanlı, İbrahim Ehmed, Hasan Bildirici, Mahmûd Lewendî, Ertuğrul Kürkçü, Zeynelabidin Zinar, Mehdi Zana, Cemil Gündoğan, M. Emin Bozarlan, Nizamettin Toğuş, Mahmud Kılıç, Torî, Ali Rıza Aslan, Ali Haydar Kaytan, Hüseyin Kaytan, Müslüm Yücel, Münir Ceylan û Murat Boztrak hene.

Tiştêkî ku ji aliyê piraniya xwendevanan ve tê xwestin jî ferhengok e. Ji 126 kesan 84 kes dixwazin di rojnâmeke ferhengok hebe, 6 kes naxwazin ku ferhengok di rojnâmeke de cih bigire. Li aliyê din lêkolînên li ser zîmên, dîrokê û nivîsên li ser jiyana gerîla tîne xwestin.

Di dawiyê nivîsê em dixwazin bidin zanîn ku emê di rojên pêş hewl bidin xwe ji bo ku guherînan li gorî encama anketê pêk bînin.

Zimanê xebatkarên rojnâmeke

Nav	Sivik	Giran
Zana Farqînî	22	4
Sami Tan	6	2
Salihê Kevirbirî	4	2
Metin Aksoy	2	1
Dildar Şeko	1	2
Rahmi Batur	2	
Aynur Bozkurt	1	
Düzgün Deniz		1





- 26.02.1910
Li cihanê çapxaneyê yekemîn ava bû.
- 23.02.1992
Rayedarê Partiya Azadî û Demokrasî (ÖZDEP)'ê yê Erzinganê Cemal Akar, ji layê hêzên tarî ve hate kuştin.
- 23.02.1992
Cemil Erin û Hemdîn Erin, li Qoserê Mêrdînê ji layê hêzên tarî ve hatin kuştin.
- 24.02.1994
Nûçevanê (muhabir) Yeni Ülke yê Batmanê Cengiz Altun, li ser Cadeya Mehtabê, wekî gelek rojnamevan û nûçevanên kurd, ji layê sê kesên

kontra ve hate qetilkirin. Ew rojnamevanê kurd ê duyemîn bû ku bi destê hêzên kontrayî hate kuştin. Berê nûçevanê 200'e Doğru Halit Güngen li Amedê hatibû kuştin.

● 27.02.1993

Dr. Hasan Kaya û Serokê ÎHD'ya Elezîzê Metin Can, ji aliyê hêzên tarî ve hatin revandin û piştî demekê, cendekî wan hate dîtin. Îro eşkere dibe ku ew ji aliyê çeteyên dewletê ve hatine revandin û kuştin.

● 25.02.1994

Parêzer (ebûqat) û rewşenbîrê kurd Yusuf Ziya Ekinci, ji aliyê hêzên tarî ve li Enqereyê hate revandin û paşê cendekê wî hate dîtin.

AWIR

Zuğaşî Berepe



Koma Zuğaşî Berepe ku bi zimanê lazî muzîka rockê çêdikin, diyar dikin ku, heta niha lazan qet li ser pirsgrêkên civakî stran negotine û siyaseta û politîka negihîştîye nav wan, an jî wan serê xwe pê neşandine.

Behr, hêvî ye, hêvî gihastina armancan e û jiyana. Ku mirov bi hêvî be jiyana dibe lê, bêhêvî be mirî ye û ji mirovahiyê re tu feydeya kesê mirî tune ye.

Zuğaşî Berepe, (Zarokên Behrê), roja 15'ê reşemîya 1997'an, li NÇM'ya Stenbolê Şaxa Beyoğlu konserek da. Zuğaşî Berepe ku bi zimanê lazî dibêje, ji 7 kesan pêk hatiye. Gotinên muzîka xwe bi lazî dibêjin. Ji layê amûrên muzîkê ve dewlemend in û muzîka rockê çêdikin. Ev kom, bi amûrên muzîka rockê ên klasîk wekî gîtara klasîk, gîtara akostîk û gîtara elektrîk, amûrên fûyî mîna flût, saksafon, tulum û amûrên ritmê kar dibe û wan bi awayekî hosteyî bi kar tîne.

Bi saetek derengmayî dest bi konsera xwe kir. Ji bo ku elektrogîtarîstê wan hîn nehatibû, bi sistî dest bi muzîka xwe kir. Wekî ku tenê bi serê xwe bin, li ser sehnê diçûn û dihatin, bi hev re diaxivîn, akorda gîtarên xwe li sehnê çêdikirin. Valahiyên di vevêberê de jî bi emprîvîzasyon (starên mecbûrî) dixwestin da-girin. Lê li gel van hemû kêmasiyan jî wan cegera xwe li ber mêvanan kêmanekin û bi hatina elektrogîtarîstê xwe (wekî ji nû ve) dest bi muzîka xwe kirin.

Li gel muzîkê di axaftina xwe de, li ser girîngiya zimanê dayikê (zîkmakî) sekinîn û diyar kirin ku Koma Zuğaşî

Berepe ji ber vê yekê çêkirine. Ew bi giştî bi zimanê lazî dibêjin, lê muzîka ku ew lê dixin muzîka rock e. Berî niha bi 2 salan kasetek derxistibûn, niha jî xebata komê ya kaseteke nû heye. Ji bilî helbestên ku wan çêkirine, yê gelêrî jî dibêjin. Endamên komê diyar kirin ku, li herêma wan hemsînî û laz bi hev re dijîn, stran û helbestan bi piranî bi hev re dibêjin, tulumê lêdixin û dîlanê digirin.


Dîsa wan xuya kir ku, ji salan heta niha lazan qet li ser pirsgrêkên civakî stran negotine û siyaseta û politîka negihîştîye nav wan, yan jî wan serê xwe pê neşandiye. Ji ber vê yekê, hemû stranên wan yê gelêrî li ser evîne ne. Endamê komê mîna bersiva pirsê bi rengê "Hûn ji bo hunermendên kurd çidîfikirin?", ramanên xwe yê li ser hunermendên kurd wisa diyar kirin: "Di warê gelêrî de, hunermendên kurd pir bi şens in û karê wan hêsantir e. Bingeha muzîka gelêrî ya kurdan pir zengîn e û pêwîst e li ser lêkolînan bikin."

Di dawîya konsera xwe de wan bal kişand ser aştiyê û daxwaziya xwe wiha anîn ziman: "Em dixwazin hêvî bikin û bi wextekî zûtirîn em aştiyê dixwazin." Wisa xuya ye ku ew di bin bandora bav û kalê xwe de manê. Çimkî ji bilî vê gotinê tişteki siyasî negotin.

SEVDA ELDEMİR

ÇAVDÊRÎ

MÎRHEM YİCÎT



Nivîskar, xwendevan û rexnegirî

Der heqê rexne û rexnegiriyê de awir û tesbîta-giştî ew e ku rexnegirîya edebî li welatê me kêma û qels e. Rexnegirîya heye bêsewîye ye, ne kûr e û ne tetmînkare. Di qonaxa îro de ku tevgera rizgarîxwaz ew çendî bi pêş ketiye, di nav kevn û nû de şerêkî çendalî li dar e û di tenîştîya şexsiyeta kevn de şexsiyeteke nû, dînamîk û rexnegirî bejn dide her tiştî li ser kursiya dadgeha aqil hatiye danîn û em ji awira fikrî û rewşenbîrî ketine ser rîya qonax û serdemê hêvîbex, hewcedariya bi rexneyan û rexnegiriyê çend qat bûye.

Kitêbek di nav çend kesan de diçe û tê. Ji çend aliyên bala mirov li ser e. Her çendî kesê kitêbê dinivîsîne bi tenê ye û kitêbê mohreke şexsî hildigre jî, ji ber ku ji bo xwendevanê hatiye nivîsandin, piştî çapbûnê û belavbûna xwe hejmara xwediyên kitêbê dibin dudo û xwendevan jî wekî xwediyekî nû û duyemîn lê zêde dibin. Nivîsandinê kitêbê çendî girîng û xizmetekî mezin be, xwedîderketina xwendevanê jî li kitêbê ew çendî şert e û ji bo jiyana temendirêjîya kitêbê derman û garantî ye. Nivîskar bi xwendevanê xwe dibe nivîskar û xwendevan jî bi afikariya berhemên nivîskaran bi pêş dikevin. Hewcedarî dualî ye û hevkarî û hevûtemamkirineke diyalektîkî dabaş e.

Xwediyên kitêbê ne yek belê dudo ne dibêjin rexnegir. Kitêba ku her bi tenê bi xwediyê yekê bisekine û xwedîtiya duhem ango xwedîtiya xwendevanê jî bi dest xwe nexe, dê mîna zaroka bêdê û bêbav li rastê û bêkes bimîne.

Behsa xwediyêke sêyem jî dibe. Ew jî rexnegir e. Xwedîtiya mirovê rexnegir li ser jiyana berhemtekî bi qasî ya nivîskar û ya xwendevanê ne xwedî gotin be jî, buha û nixê wan bi vê xwedîtiyê berz û bilindtir dibe û xwediyên yekê û yê duyem bi saya vê xwedîtiya sêyemîn rola xwe baştir diltzin. Nivîskar dinivîsîne, afirîner û xaliqê berhemana e. Xwendevan berhemê dixwîne, jê îstîfade dike û bi afikariya wê zana û agehdar dibe. Civat û dora xwe, derd û pirsgrêkên serdema xwe nas dike.

Tu li eslê wê binîhêrî rexnegir jî xwendevanek e. Ferq ev e ku ew ne her xwendevan e, ew xwendevanekî nişmîtir e, jîtir û jêhatîtir e, zanatir û bikêrtir e. Bi van alî û an xisletên xwe ew ji piraniya xwendevanê vediqete, xweser dibe. Wiha jî mirov kare bibêje: Rexnegir xwendevanê bi tecrûbê, çeknas û kurnîkê kitêban e. Ew kitêban bi çavekî din dixwîne. Bi mêtî û hewseleyeke din heldisengîne, mîzên û pîvanên wî cihê ne. Çi çî ye, ji ber çî wiha û ne bi awayekî din e, xurtî û qelsî di ku de ne, bi zelalî û sayitiyê ku jî her kesî nayê dibîne, radixe ber çavan. Ew serafê kitêban, jiyana û cîhana hundirê wan e. Ew vê dinyayê qul-bi-qul nas dike, avde bi avde jê haydar e. Di kîjan terkê û derzê de çî heye, li ku çî veşartîye, çî jî dil e û çî ne jî dil e, çî çendî baş û serketî hatiye gotin û çî nehatiye gotin, avahî çendî saxlem e, li hemberî dijwartî û êrîşên zemênê çendî xwe bigire, ne her car be jî pir caran heger jî û guhdik be dibîne, texmîn dike. Rexnegir di nav berhemên nivîskar û xwendevanê de şiklek qasidî e. Ev qasidî çendî objektîf, durist û rastgo be û çendî li gorî qeydayên xwe be, ew çendî hedefbîne, rêpêşander e û baştir e.

Rast e, rexnegirî şiklek rêberî û qelawîzî ye jî. Dema ew fenek û xapînok be, an jî bi hêrs û kezab be, bi tenê nivîskar û jiyana wî bike hedef her tiştî dikare berê xwendevanê tekeve aliyekî şaş, xerab û ne rast. Lewre rexnegir dikare bi hejmareke mezin ji xwendevanê bilîze, wan şaş û berkaş bike.

Mebesta serêkî ya rexnegiriyê divê ew be ku nivîskar baştir binivîsîne û xwendevan jî baştir bixwîne. Rexnegirî bi mercê ku layiqî navê xwe be karekî pîroz e. Edebîyateke hemdem rexnegirî xurt, durist û cidî dixwaze. Perwerdekirin, şarezakirin û zanekirina xwendevanê jî pir girêdayî rexnegirî û rexnegiriyê ye.

Li gora Wolfgang Von Goethe (1739-1832), wezîya rexnegirî ew e ku qabiliyeten kevn û nû tap bike û qabiliyeten nasîrî careke din saxtî bike, hêlsengîne. Bi gotinê din ew e ku li aliyekî yê nenas bide nasandin û li aliyê din yê ku nas û navdar in kontrol bike. Di çavên Goethe de rexnegir mirovekî pir mezin e: "Ew kesê ku xelatîyê min rast bike, ew koleyê min be jî, dibe efendiye min."

Lêgerîner Ahmet Aras:

Evdal, ne tenê dengbêj destanbêj e jî

Zengîniya wêjeya me ya devkî, ji aliyê her kesî ve tê qebûlkirin. Her wiha dîsa tê gotin ku wêjeya nûjen jî li ser a gelêrî ava dibe. Kurd, bawerîya xwe bi van gotinan tînin, lê berhevkarên zargotina me bi taybetî li Bakur pir kêr in. Ahmet Aras ji wan kêr kesan e ku bi zargotina kurdî bilîf dibe. Hevalê me FEREC ÇOBANOĞLU pê re axivî.

Lêgerîner Ahmet Aras, der barê wêjeya kurdî ya devkî de, pirtûkeke giranbuha pêşkêşî gelê xwe kir. Di vê xebatê de gotinên wekî "Evdalê Zaynikê, Homerosê Kurda ye", "Evdal, ne tenê dengbêj e, destanbêje jî", "Berî Evdal jî û piştî wî jî tu dengbêj mîna wî tune ne", "Di jiyana Evdal de ne tenê wêjeya kurdî xuya ye, bi xwe civaknasî, ruhnasî û fîlozofîya kurda jî tê ber çavan" balê dikişînin ser xwe.

Me der barê Evdalê Zeynikê û wan gotinên balkêş de, pirs ji Ahmet Aras kirin.

Birêz Aras, dixwazim pêşî bipirsim ku Evdal çima Homerosê kurdan e?

● Çawa Homeros ji bo wêjeya yewnan kesekî mezin û navdar e, kenvarên ye; Evdalê Zeynikê jî bi qasî wî navdar û kenvarên ye. Evdal jî wekî Homeros efsaneya ye ji bo gelê xwe. Evdal destanbêj e jî. Bi dengê xwe diqîre, kilaman dibêje.

Evdal li ser kîjan mijaran kîlaman gotine?

● Ez dikarim bibêjim ku li ser her tiştî gotiye. Evdal dengbêjê evîniyê ye, yê civakî ye, yê têkoşînê ye, yê xizantiyê ye...

Yekemîn car hûn jê re dibêjin Homerosê kurdan?

● Na ezbenî. Di sala 1969'an de nivîskarê navdar nivîseke min xwendibû. Di wê nivîsa xwe de min qala Evdal jî kiribû. Yaşar Kemal li min geriya û me hev û din dît. Gote min: "Tu zanî Evdalê Zeynikê kî ye, ew Homerosê kurdan e. De ka te bûjêrî dane hev, hez dikî em bikin roman."

Min ew nepejirand û axirê me nekir roman. Lewrê wê biherimiya. Dû re Yaşar Kemal di pirtûka xwe ya "Yer demir, gök bakır" de ji Evdal re gotiye "Homerosê kurdan" (r:125-129)

Hûn karin ji kerema xwe re der heqê jiyana Evdal de me agahdar bikin?

● Belê, ser çavan. Niha li gorî lêgerînên min Evdal, di destpêka sala 1800'î de wekî lawê malbateke xizan

hatiye dinyayê. Di sala 1913'an de ji çûye ser dîlovanîya xwe. Ango nêzî 110 salî jiyaye. Lê, dengbêjiya wî gava ku temenê wî bûye 30 (sî) sal, dest pê bûye. Lewrê jî 30 salî û pê ve jiyana wî hîn ronî ye, balkêş e.

Çima û çawa bûye dengbêj?

● Gava ku Evdal dest bi dengbêjiyê dike, ji aliyê civakê û rayedarên el û eşîrên wê demê ve nû tê nasîn. Ji bo wî jî, dengbêjî wekî jî nû ve ji dayika xwe

Di sala 1969'an de nivîskarê navdar nivîseke min xwendibû. Di wê nivîsa xwe de min qala Evdal jî kiribû. Yaşar Kemal li min geriya û me hev û din dît. Gote min: "Tu zanî Evdalê Zeynikê kî ye, ew Homerosê kurdan e. De ka te bûjêrî dane hev, hez dikî em bikin roman."

bûn e.

Evdal 30 salî ye, xewnekê dibîne ku garis vedirêşe. Hema serê sibê diçe cem kalepîrê gund da ku wateya xewnê bide şîrovekirin. Kalepîr jê re dibêje: "Ger te ev xewn di 15 saliya xwe de bidîtîya, tuyê bibûyayî alimekî mezin; ger di 20 saliya xwe de te bidîtîya tuyê bibûyayî dewlemendekî mezin. Lê te xewn di nivê temenê xwe de dîtîye, tuyê bibî dengbêjekî mezin."

Rojekê Evdal nexweş dikeve, mîna beratakê (bi gotina gel) razaye di nava livînan de. Xanima Eyşo jî avê tê (ji der ve) dibîne ku Evdal di nava litêmê de dinuhînine; lolô, lêlê dibêje. Dikele mîna sîtila tije ku li ser kelê ye. Eyşo Xa-

nîm pir ditirse û gazî cîranan dike. Cîran tînin ser, hinek dibêjin Evdal ketiya ta û sekemê (wekî bêfêşê ye) hinek di-

bêjin bayê cinan lê xistiye û hinek jî dibêjin dîn bûye.

Ji wê rojê û pê ve li ser her bûyerê kilaman dibêje, li ser xweşîkbûna keçik û mîrxasiya mîran kilaman dibêje. Li ser xizantiyê, li ser mîr û begên el û eşîran, li ser şerê nava wan kilaman dibêje.

● Gava ku mirov li jiyana Evdal dinêre taybetiyên ku tînin ber çavên mirov hene?

Belê. Ez dikarim jiyana wî bikime sê paran û di van xalan de taybetiyan binirxînim

1) Ji destpêka dengbêjiyê (1830) he- ta 1865'an. Bi dengbêjîyê navdar di-

be. Bi gotineke di cih de, nav û dengê wî li her derê belav dibe. Mîr û beg dixwazin wî nas bikin, bibe dengbêjê wan. Ez karim bibêjim bîngeha dengbêjiya wî ya efsaneyî di vê demê de tê avêtin.

Di wê demê de mîr dibe, beg dibe, paşa dibe her yek xwedî dengbêjekî ye. Nav û mîrxasiya beg û paşayan, bi nav û dengê dengbêjên wan belav dibe, bi ser dikeve. Ji ber vê yekê, dengbêj bi saetan, hetanî bi rojan kilaman diavêjin ber hev. Ev leca dengbêjan e û dengê kê bikeve, mîna dikên şer ji qadê direve, qad ji yê din re dimîne. Leca Evdal û dengbêja Surmeli Memed Paşa, Gula Fileh, sê roj û sê şevan didome û Evdal bi ser dikeve, paşiyê dilê Gulê dikeve Evdal. Em jî vê lecê her du bendê dawiyê nîşan bidin.

Gulê dibê:

*Evdal tu werê destê min bigre, emê herin mala me ye
Ezê ji te ra deynim orxan û doşekên qadîfe ye
Ezê ji te ra çêkim birincê Qerecdaxê bi suzme ye
Ezê ji te ra çêkim cotek gorê kurmançî dizleme ye*



Tu ku vegeriya jî, ji te pirs kirin gotin
 îkrama Gulê
 Bêje îkrama Gulê ji serê heftê û heft
 bavê mi zêde ye
 Way can Evdal, wey can Evdal
 Heyla kirîbê Evdal ez heyirî te mam...

Evdal dibê:

Wey can Gulê, wey can Gulê
 Bejnziravê, wek qamişê devê golê
 Çavê reş in bi rengê hubrê
 Poz bivilnê ji nikulê kewê
 Lê dixê sura Qetewînê
 Bayê Sipanê, hewa Bilêcanê
 Awaz bi awaz dihejinê

Wey can Gulê, lê Gulê canê
 Heyla xeberxweşê mi bi heyranê
 Şemamoka li nav bostanê
 Suravêlka li nav mêrganê
 Gulê te ez kuştîme,
 Bi zarê şîrîn bi vê xeberdanê
 Wey can Gulê, wey can Gulê...

Piştî vê lecê, Surmeli Memed Paşa, gundekî dide Evdal da ku bibe dengbêjê wî. Lê çavê Evdal ne li malê dinê ye, qebûl nake.


2) di salên 1865-1888'an de Evdal kor dibe, 7 sal roniyê nabîne. Zarokekî dihevine, xwedî dike, navê wî Temo ye. Temo wî herêm bi herêm digerin, bi destan digire. Evdal pir feqîr û xizan dibe. Rewşa ku tê de ye dijwar û ne baş e. Kes êdî xatir jî wekî berê nadê. Di van salên ku kor maye de, qulingekî baskşkestî kedi dike, wî rihet dike. Êdî quling ji xwe re dike dawêr (sembol) û bi kilaman bi quling re dipeyive û jê re dibêje. Hevalbendên wî Temo û quling in.

Kilamên Evdal ên vê demê li ser xizantiyê ne. Dilê wî bi halê wî dişewite, li ber mîr û began radibe, bi kilaman wan tawanbar dike. Evdal dengbêjê kurdê xizan e, lê xizantî jî pê ne xweş e. Di kilameke xwe de dibêje: "Mîrin çêtir e ji xizantiyê."

Rewşa xwe û qulingê baskşkestî dişibîne hev û dibêje: "Ew jî wekî min ji refê hevalê xwe maye." Ji bo wî quling dawêra azadiyê ye. Quling difirin, bilind dibin, li her welatî digerin. Ew jî berê digeriya, diqîriya û bi xatir bû, lê niha kor û xizan e.

3) Ji 1888'an û bi vir ve heya mirina wî. Çavên wî avarêş bi ser de hatibû. Piştî ku ji alî bijîşkên îranî ve derman dibe, çavên wî vedibin, roniyê dibîne. Baskê quling jî bi çebûna çavên wî re rihet dibe. Dixwaze ku quling hembêz bike, lê baskên xwe li hev dixê difire, bilind dibe hetanî wînda dibe. Quling jî û ew jî careke din digihîjin azadiya xwe.

Evdal piştî ku çavên wî vedibin li hespê xwe siwar dibe, herêm bi herêm digere; mîna zarokekî bi dinê şad dibe. Êdî wî mîr û beg nas kirine bi saya rewşên xerab û dijwar. Dost û neyar kî ye baş dizane. Li gorî vê pîvanê kilaman dibêje. Di vê demê de, şerek di nava Şahê Ecem û Tahir Xanê Qelenyê (Serdarê Kurd) de derdikeve. Lê ji ber ku gelek êl û eşîrên kurdan ên din alîkari-



ya yê didin Şahê Ecem, Tahir Xanê Kurd mexlûb dibe. Li ser vê bûyerê Evdal kilamekê derdixê; di vê kilamê de tim "Ez birîndar im birano", dibêje. Ji ber ku êl û eşîran bi hev re biratî nekirine, gazinan dike bi vê gotinê.

Gulê, Lo Mîro, Lê Axçik Canê, Sincarî Talo, Evdal û Şêx Silê, Dêrsim e Xweş Dêrsim e, Wey Xozanê Heyla Wayê, Hekîmo hwd...

Mamoste we azîneke çawa pêk anî di vê xebata xwe de?

Niha li gorî lêgerînên min Evdal, di destpêka sala 1800'î de wêlî lawê malbateke zizan hatiye dinyayê. Di sala 1913'an de jî çavê ser dilevaniya xwe. Ango nêzî 110 salî jiyaye. Lê, dengbêjiya wî çawa ku temenê wî bûye 30 sal, dest pê bûye. Lawê jî 30 salî di pê ve jiyana wî hîn ronî ye, balkêş e.

We kilamên wî ji kîjan dengbêjan girtin?

● Navê çend kesa bibêjim. Neviyê wî Emerê Zeynikê, Şakiro, Kazoyê Garisya, Resoyê Kopala, Şeroyê Biro, Hemidê Mecîd, Zahiro...

Kilamên wî yê bi nav û deng kîjan in?

● Nehate tespîtkirin ku çend kilamên wî hene, lê min di ser 20 kilaman re dane hev. Ji bo nimûne navê çend heban:

Ezê ji Erzîromê Hatim bi Karwanî, Dîlber, Şêx Ronî, Hayê li Min, Evdal û

Ahmet Aras di sala 1944'an de li gundê Qereyaziyê, li Mele Osman hatiye dinyayê. Di 1970'yî de jî Fakulta Aboriyê qedandiye. Aras, di salên 1965-66'an de bi sedemên siyasi tê girtin.

Piştî 12'ê Adara 1971'ê jî ber derbeya leşkerî ya tirk, derdikeve derveyî welat û li Siwêd bi cih dibe. Hetanî sala 1978'an li namostetiye dibe.

Berî 1980'yî, demekê di nav DISK'ê (Konfederasyona Sendikayên Karkeran ên Şoreşger) de dixebite. Di sala 1979'an de li Îzmîrê bi cih dibe û mala wî niha li wê ye. Piştî sala 1980'yî jî alî dewletê ve dişa tê girtin. Di kovarên ANT, EMEK, YÜRÜYÜŞ, AZADÎ û RONAHÎ de nivîsên wî hatin weşandin. Ji mêj ve li ser zargotina kurdî dixebite. Ji van xebatên wî destana "Ker û Kulik", "Şiyabend û Xecê", di sala 1993'an de hatin weşandin. Ker û Kulik di sala 1995'an de li Swîsreyê îcar bi zimanê Almanî hatiye weşandin. "Şairê Kurda yê Efsanevi: Evdalê Zeynikê" berhema wî ya dawî ye.

ya, hîn çêtir bû, li gorî min.

Birêz Aras, ez dixwazim der heqê zimanê pirtûkê de fikra xwe bibêjim. Zimanê pirtûkê li gorî min piçekî herêmî ye. Devoka Serhedê hatiye bikaranîn, bi şîrovên we. Hûn çî dibêjin di vî warî de, xwendevan wê we rind fêhm bikin?

● Çewtî di zimanê pirtûkê de hene. Yek jê ji tîprêzan, ji alî çapxaneyê ve hatiye holê. Wê ev di çapa duduyan de rast bibe bi gumana min. Ya din li ser devokê herêmî hûn dibêjin, jixwe ez jî serhedî me. Normal e ku min ew devok bi kar anîbe. Lê heta ji min hat min xwest ez xwe bigihînim standardeke ziman. Ji min ew qas.

Xebateke ku hûn niha pê dadikevin heye?

● Ez spasdarê rojnameya we me. Niha kêfa min li cih e. Ji sala 1961'ê de min bûjen didan hev, ji bo ku ez destana Evdalê Zeynikê binivîsim. Berek ji ser milê min hat hilanîn. Dixwazim di demeke pêş de liser Dewrêşê Evdî xebatekê bikim. Ji niha de, di dest min de bûjen heye, bingehê datînim.

● Belê ev niqte pir girîng e. Ji bo xebateke wisa azîneke zanyarî divê bê şopandin. Lêgerîner divê ne dizek be û nixrên gel ji xwe re neke mal. Ez kîjan salê bi kê re axivîm, ew kes li ku ye, çend salî bû, min hemû nivîsandin û bûjen bi awayekî orjînal min dan çapkirin. Ango azîneya min bi bingehê zanyarî zargotinî ye.

Pirtûka we û romana Mehmet Uzun, li ku dişibe hev, li ku ji hev cuda dibe?

● Pirtûka min li tu derê ne wekî ya Mahmat Uzun e. Mehmet Uzun ev destana kurdan Evdalê Zeynikê herimandiye. Rojek ji Rojên Mehmet Uzun bû-

Çend helbestên bijarte

Di mirinê de jiyân

Her der tarî, war tev bêdeng
Bêdengiya mirinê bû.
Berdêla dengiyê mirin
Ya jiyânê berxwedan.

Cuhên ava,
Di newal û kaniyan de sor herikîn
Berfa sipî di çiyân de reş girêda
Roj xwîn digirî
Ewrên reş hêstirên sar dibarandin
Tefiyân tev stêrkên ezmana...
Ew roj navê jiyânê mirin
Navê mirinê Kurdistan bû.

Yek dudu panzdeh bîst
Nehat di tariyê de arama wan.
Çavên xwe vekirin û serên xwe
rakirin
Êrîş kirin ser ejderha
Bêserok,
Bêsemyan,
Bê plan û bê pergal.
Êrîş kirin bi lingên xwas
Bi pêsîrên tazi
Dîsa
Herêmi dihat
Dengê neviyên Medan.

Êrîş kirin êrîş kirin
Lê zû hatin rûxandin
Zû hatin perçiqandin
Ji wan û şûnde ma
Solên qetiyayî û
Pinê bi keleman ve daleqandî...
Weşiyân tev wekî pelgên daran.
Navê serhildana bû bêdengî
Navê Kurdistan bû welatê mirinê.

Dev nalivin,
Çivîk fir nadin û dar şîn nabin.
Berê jiyânê kete sereba tarî
Û ber bi mirinê ve...

Ew roj,
Yek çirûska agir ma veşartî.
Bû dilopek ronahî û bû dilopek jiyân
Li Fîsê jenî...

Axê ronahî,
Bayê agir hambêz kir.
Bû tovê jiyânê û hate çandin
Roja 27'ê sermawezê...
Ji dilopê bû pêt,
Ji pêtê bû alaz
Rojê rê ronî kir
Axê hêz, avê jîn dayê
Bayê alaz belav kir.

Çiya, dol û zinar germ bûn
Deşt û zozan bi avzêman derbûn
Giyan gehîşt qalib, xwîn lê geriya
Rojê ronî dâ û ro hilat...
Çend stêrên sor geş kirin

Meşiyân stêr
Li ser newalên reş, serebên tarî.
Rêzan ji nû ve rê û ristîk danî
Ava heyatê ji qudrêtê anî
Dîrok ji nû ve honand
Helwestek nû jê deranî...

Parçek ji Îsa yek ji Muhammed
Parçek ji Marx û Lenîn
Bi xewfa Ristemê Zal
Ilmê din ji jiyana xwe deranî.
Bû ramanek nû û hemdemî
Wekî Mehdi serê xwe hilda..
Sîngê xwe da yê decal
Şûrê xwe kişande Ejderha.
Jîn da dar û beran
Çek da destê wan
Da bikujin mar, dûpişk û guran
Ji bo rabe qirêj û gemar
Ji nav jiyana gelan..

Derhem derhem, misqal misqal
Berhev kir bi xwêdana xwe
Dexist holê nîrx û rengê mirovahiyê.
Her dilopek ji xwêdana wî
Bû pêt û alaz
Bû refên teyrên baz
Ref bi ref,
Firdan cî û warên xwe...

Şopa xwêdana wî
Bû meşaleyê jiyânê
Kete destê hezaran milyonan..
Rûpelek ji dîrokê qetand..
Ya tede nivîstî,
Îxanet rûxan û mirin.

Dest pê kir bi hatinek nû
Bi ramanek rast û zanistî
Bi bîr û baweriyek xurt
Ji bo gelê kurd
Ji bo gelên bindest.

HÎŞAR BAGER

Agirê Welêt

Ji bo bîranîna bijîşk Agir
(Dr.Orhan Ersoz)

Agirê sor
Bijîjkê welêt
Piştî sonda mezin
Sonda Hîpoqrat
Dil da dest dilê har, dilê sivik
Ku mîna çivîkan lê dida
Berê xwe da çiyayê spî
Û herêma Çilkanî.

Roj
Ji ezmana daxist erdê
Belav kir taristan
Êş û jan tune kir
Derman kir

Pizik û birinên zarokên xwas
Bê derpê û belengaz
Lew agir bû dijminê reşahiyê.

Bû bablisok
Belav kirin ewrên reş
Ji ezmanê welêt bû ava mezin
Pêl li ser pêlê herikî
Deşta Amedê bû şape, bû lehî
Ber bi gelî û newalên Çilkanî
Dijenî dilê har.
Lê dida lê dida
Herifî diwarê dil
Dil firiya
Dilê delal
Hat hewara zarok û pîrekên
Bêxwedî, nexweş, bi êş û jan
Tawî û bawî..

Dil raxist dilê kuban
Bû heyv bi şevê
Roj daxist erdê
Bi ro malîst
Taristana li ser welêt.

Agir bû Agir
Agirê sor tu car natefê
Venamire, venamirê
Agirê welêt.

JÎR DILOVAN

Dengê min tê te hevalo

Dema tu çû bi pistepist te digot:
Ji bîr kirin...
Lê tu carî.
Tê bibî gulek, tu car naçilmisî
Tu carî rehên wê hişk nabin di dilê
min de
Heta ez bijîm.
Her ku tu bê bîra min
Wê şîn bibe
Her ku ez bîhn bikim wê vebe.
Ezê tovên wê bipijiqînim
Li çiyân û zeviyan.
Ezê tahtan biqelêşim
Û tê de biçînim.
Ji bo her bihar ez derkevim çolê
Ez te bibînim
Li binya darên mazî û berû.
Ez te bîhn bikim
Li ber rexên çemên Kurdistanê
Ez dengê te bibihîzim
Bi dengê berxikan û karikan re
Û ez te binim bîra xwe
Li ber kevirê gora faîl bêdiyar
Her guleyên keleşê ezê bikim gul
Û pê navê te binivîsinim
Li asîmana.

Belê,
Heke berî tu biçê
Te ez fêm kiribim

Ji bo jiyana bêyî te
Wê ji min re bibe sebr û aram.
Dengê min tê te hevaalo?

ÇIYA MAZ

Biharê

Ax biharê.
Heta kengê riya te bipê
Te dîsa bibînim.
Stêrên bêçirûsk
bişkivîne li ezmanê sewt û deng
Siya gulên cemidî dane dest Mem
Zîn
Evîna wan dardakirî
Jiyân bêbîhn û reng.
Ax biharê;
Agirê dilê min
Gola Wanê ya wek şîrê spî dixemilîne
Keçîkek bi rûyekî wek gulênîsan
Helbestek evîndariyê
Di nav nên de dide min.
Ax biharê;
Ez girtiyê hesretek kor
Yê çendan im ku
Tamerên min gum gum in?
Di hundirê min de
Daristanek kesk heye.
Ax biharê;
Ewna nezerên te ne
Yên ku guliyên min
Gulebaran dikin...

SEYDOYÊ KÛSO

Mirin

Dema bihar
li welatê min mir
Dilê min bû
payizeke bêdawî.
Û dema evîn
li welatê min mir
Dilê min bû
goristaneke kevnar.
Lê dema birakujiyê
li welatê min dîlan kir
Di dilê min de
dîlana jiyânê
Rawestiya.

Gul

Ew gula ku min
ji te re jêkiribû
Bi hezaran gul
li ser giriyan
Û dema bihistin
ku di bin
Sola te de
perçe bû
Hemûyan
rengê xwe
Winda kirin.



Li navendên çandê çalakiyên ve hefteyê

Li NÇM'ê

● 23.02.97 **Yekşem**: Konsera Koma Agirê Zerdest ji NÇM'ya

Izmirê, saet:14.00

Şanoya Hêlin: Beyê Elegezê, saet: 17.30

● 26.02.97 **Çarşem**: Söhet: Ji kovara Leman Ender Özkahraman, Metin Üstündağ : "Mizahın Toplumsal işlevi (Fonksiyona Civakî a Mizahê), saet:18.00

● 28.02.97 **În**: Filmê Winda, saet: 18.00

Li NÇM ya İzmirê

● 23.02.97 **Yekşem**: Konsera Koma Dengê Azadî, saet:17.30

● 26.02.97 **Çarşem**: Konferansa Cemşid Berder li ser metodolojiya dîrokê, saet:18.00

Li BEKSAV'ê

● 23.02.97 **Yekşem**: Kofersan-Hüsnü Aksoy: Ramana diyalektîk a xweser (1), saet:13.00

Panel: "Ma rola dîrokî ya çîna karkeran xelas bû?" Dç.Dr.Nail Satılğan, Prof. Dr.Izzettin Önder, Hakkı Gerçek (rojnameya Dayanişma), Hüseyin Gözen (mamoste), saet:17.00

RÛDAN

Pênûsa te çeka te bû

Sala 1992'yan, di 24'ê reşemiyê de roja duşemê, Cengiz ji malê der dikeve ji bo ku here karê xwe. Lê hezên tarî plana kuştina Cengiz çêkirine û ew roj hatiye ku mebesta xwe ya gemarî pêk bînin. Haya Cengiz ji vê mebesta hezên tarî hebû. Lê dîsa jî wekî her roj bi heyecan çû ser karê xwe, ji bo ku rûyê van î reş eşkere bike.



Cengiz ALTUN di sala 1968'an de hate dinê. Dibistana yekemîn, navincî û lîse qedand. Salek bi şûn de bi dest xwendina xwe ya li zanîngê kir. Vê demê di rojnameya hefteyê Yêni Ülkeyê de dest bi rojnamegeriyê kir.

Cengiz, hem diçû mektebê hem jî di rojnameyê de dixebitî. Lê dêhna wî bi zêdehî li ser rojnemevaniyê bû. Hele ku di ber xizmeteke gelê xwe de bûya.

Cengiz, bi ser neheqiyê ve diçû, tade û zîlm û zordarî dinivisandin, ji ber nivîsên xwe gelek caran kete binçav, di bin çav de bi îşkenceyê rû bi rû ma. Li mektebê jî aliyê faşîstan ve di hate teşhîrkirin. Çima ku rojnamevanê kurd bû, di çûn û hatina xwe ya mektebê de tûşî astengiyên dibû. Lewre jî dilê jî xwendinê sar bû. Ji bo ku neheqiyên ku li kurdan tene kirin deşîfre bike, rojnamevanî girîngtir didît. Diçû gundên ku cerdevanan tade li gundiyan dikirin. Bi wê tenê nema, axlep li ser têkiliyên tarî yê dewletê bi rêxistinên mîna Hizbî-kontra sekînî.

Dî sala 1992'yan de gelek mirov ji aliyê Hizbî-kontra, ango kontrgerîla ve hatîbûn kuştin. Cengiz der heqê van kuştinan û windakirina di bin çav de nivîsand.

Wî zanîbû ku Hizbî-kontra êdî hewê jê diqere. Carcaran li derva di hate tehdîtkirin, telefonên tehdîdan jê re dihatin, lê bawerîya wî nedîşikest, hê xurtir dibû. Cengiz eşkere kirina têkiliyên dewletê yê qirêjî û rojnamegeriya kurdî wekî karekî pîroz didît.

Ew, di çavên wan hezên tarî de bûbû

strî. Êdî ew strî bi şiklekî diviyabû bihata şkenandin. Sala 1992'yan, di 24'ê reşemiyê de roja duşemê, Cengiz ji malê der dikeve ji bo ku here karê xwe. Lê hezên tarî plana kuştina Cengiz çêkirine û ew roj hatiye ku mebesta xwe ya gemarî pêk bînin. Haya Cengiz ji vê mebesta hezên tarî hebû.

Lê dîsa jî wekî her roj bi heyecan çû ser karê xwe, ji bo ku rûyê van î reş eşkere bike. Belê ew hezên tarî jî der heqê Cengiz û jiyana wî de, ne agahdar bûn. Ji wan re emir hatîbû: "Hûnê filan kesî jî holê rakin, li ber me asteng e." Dibêjin û wan dişînin ber mala Cengiz nobedariyê.

Serê sibê saet di 09.30'an de Cengiz, ji malê derdikeve, nobedar jî li bende ne ku li cihêkî nepenî lê bireşînin. Li ser Mehtab Caddesi li ber camiya Hecî Şêrîn berê çekên xwe didin Cengiz û ji paş ve lê direşînin.


Di wê kêliyê de Cengiz ku çavê wî li xwînê dikeve, belkî jî ji xwe re fikirîbe; ma qey dawîya jiyê min hat, wê ev qas neheqî li meydanê bimînin, hewê kes dinivîse. Belê li Tirkiyeyê gava tu rojnamevan bî, divê ku tu li ser zîlm û zordariyê, îşkenceyê, di bin çav de windakirîne, şewtiandina gundan, koçberiyê, hezên tarî, li ser Hizbî-kontra û girêdayiya van bi dewletê re nenivîsînî. Ku te nivîsand dawîya jiyê tê, jiyana te dikeve destê wan, te jî bo çareserkirina van pîrgirêkan fermana kuştina xwe xist destê wan.

Te gotîbû: "Pênûsa min çeka min e." Em jî dibêjin: "Çeka ku te daniye, emê hilgirin."

AZAD ZÊRO

TÎŞK

LERZAN JANDÎL



Şenikiyê ma û ma

Angorê venguvacê newiyî Kurdistanê Başûrî de aşma remazanî miyan de êrîşê serê Asuriyan û şaranê nemûsulmanan berdeyam kerd û dawiyê de jî roja 10.02.1997'î Şaklave de, pî û lac di Asurî amê kîştene û bonê dînan jî amê vêşnayene.

Ez nê êrîşî protesto kena. Birayanê ma Asuriyan re sareweşiyê wezana. Û ez wezana, ke PDK succaranê na biyene doz kero, cezaya dînan bidêro ci.

Ganî na biyene ser ro her kîmanc, her asurî, her muşluman, her êdîdî, her aevî bi kîlmiye her kesê Kurdistanî rêyna û sere ra bifikro!

Ma bi xo bindestê me. Weltê ma de zor û zulmê koledaran ma kerdîme bêzar. Dewê ma ênê vêşnayene, kesê ma ênê kîştene, ciwanê ma êno qedexekerdene, ma û piyê ma wa-û birayê ma heps û-û zîndanê koledaran de nalenê. Seke na ma re şenik e, bes niya, na raye jî tenê kesî şenikiyanê wertê ma kîşenê, çeyanê dînan vêşnenê.

No çî zîlm o, no çî cehalet o, na çî barbariya! Hetanî key ma bê vengî bivînderîme. Hetanî key ma xo dime niyamedîme. Hetanî key ma xeta û gunayanê xo, xetekar û gunekaranê xo mevînimê. Hetanî key kesanê ke ebi namê şarê ma suc kenê ra, succaran ra hesab mexersîme. Dawiya sedseriya 20'an de no çî şermêde giran o.

Şarê ma binê zordariya koledaran de zaf ont/ant. Ewro parçeyêde welatê ma de azadiyê de relatîve esta. Ma naca se bikemê? Seke cuhuda faşîzmê Almanan ra ont û bado jî ere Filîstîniyan da ontene, ma jî ere asuriyan, êzdiyan, Ehl-î Heqan bidîme ontene?

Yan jî ma ganî dîroka xo ra diyen û ontene xo ra derse bigerîme? Yan jî zê tîrkan şenikiyanê wertê xo bihelmîne, biqedîme?

Nê, nê, ganî no karê ma mebo. Ma, yanê şarê ma ebi her kesê xo, ebi her partiya xo, ebi her bawerîya xo hemverê nê xirabiyan bivêcimê!

Meseleya şenikiyan teyna meseleya politîka û politîkvanan niya. Na mesela meseleyê de zanayena dîrokî ya.

Verde roşnabîrên ma, partiyê mayê demokratîkî, dewijê ma, nivîskarê ma, hunermêndê ma û her çîra ver jî çapemaniya ma hemverê nê zulmî bivêciyê!

Ma ganî vende şenikiyanê wertê xo dîroka dînan, bawerîya dînan û her çî ra ver jî waştene dînan bizanîme. Ma ganî tim bifikirîme; koldaran ere ma se kerd, çî ard sarê ma ser? Ma çînayî re hunde zor û zulm dî? Ziwanê ma, kulturhe ma, bawerîya ma, nameyê ma qeyî qedexê bî? Koledara qeyî waşt, ke ma wertê xo de vila kerê, biqedêne?

Ma se şîkînimê ewro nînan xo vîra bikerîme û ma zulmêde niyanên biyarîme sarê şenikanê xo ser. Ganê şenikiyê wertê ma xo ra, kesitiya xo ra meşermê û metersê! Ganî şenikiyê wertê ma waştene xo kêm mekerê! Ganî şenikiyê wertê ma xo zê ma bivîne! Ganî şenikiyê wertê ma prensîbê zêyewbîntiye her hetê jiyana xo de bivîne, ere dayê bawarbe.

Ganî şenikiyanê wertê ma bawar bê, ke qe kesêde dhinan seba dîne dînan, seba ziwanê dînan, seba fikrê dînan û seba şîklê dînan nêno kîştene, neno asîmîle kerdene!

Ganê ma na bawerîye jî ebi her çiyê xho yê rojanî biderîme nê şenikiyanê xo. Seba naye jî ganî zanyenêde dîrokiya newiye wertê şarê ma de bêro vilakerdene.

Seba naye herman weşermîne! Wertê ma û şenikiyan de pirdanê biratiyê virazê! Pirdê ke estê zixm kerîme!

Şeva xezebê

Seveke avrêlê bû. Berf û şilî tevlihev dibariyan. Hê berf bi hemdê xwe li erdê bû û ji ber barana şilope her diçû virtoq virtoq dibû. Berfa ku li erdê, çiqas derva ronahî kiribûya jî, ewrên reş ketibûn ser gund û şev gelekî tarî bû.

Newal tijî tijî diherikin û tevli Çemê Mûradê dibûn. Çemê Mûradê cemedê li ser xwe qetandibû û bêserî diherikî. Dengê Çemê Mûradê wekî melodyekê bi ser gundê ku di tariyê de bédeng razabû, ketibû.

Piçekî bi şûn de ev bédengî xira bû û ji nişka ve dengê top û tivingan hat. Bi vî dengî re welweleyek ket nav gund û her kes şerpeze bûbû. "Lawo arteşa tirk gundê jor bi tevî zar û zêçan ve şewitandin û niha ber bi gundê me ve tèn. Zû bikin, ji malên xwe derkevin. Zar û zêçên xwe xilas bikin" digotin.

Tirseke mezin bi ser gund ketibû. Gundî, her yek bi aliyekî ve direviyan. Deriyê gom û tewleyan vekiribûn û pez û dewar berdabûn ser lodan û kadînan. Gundiyar, di vî şeva xezebê de piçek saber an jî ar û lihêfek du lihêf digirtin û bi lez ji nav gund derdiketin. Muxtarê gund, bi dengê xwe yê stûr bang dikir "Lawo li ber deriyê mizgeftê kom bibin, emê tev bi hev re bimesîn" digot.

Pîrê, gopalê wê di dest de hêdî hêdî ber bi mala lawê xwe Misto dimeşiya. Li ber deriyê mala lawê xwe sekinî. Lambeyên lawê wê vemirî bûn, lê derî vekirî mabû. Pîrê dil bixem di derî re hêdî hêdî ket hundir. Çavên xwe gerandin, bi dûv re di tariyê de destên xwe gerandin, lê bişkoka elektrîkê nedît. Di wê navberê de li firaqan qelibî û kete xwarê.

Bi teqereqa firaqan re zarokên ku di xew de bûn hişyar bûn. Pîrê ji nişka ve sekinî û guhdarî kir. Destên wê dilerizîn û serê wê dihejiya. Destên xwe di tariyê de gerand, gopalê xwe dît û bi alîkariya gopal rabû ser piyan. Dûv re hêdî hêdî ber bi odeya paşî ve çû. "Pitik. Van bêbavan pitik ji bîr kirine" got û di tariyê de destê xwe li dergûşê gerand. Dû re dergûş dît û zarok ji bêşikê derxist ew kir hambêza xwe. Piçekî bi torinê xwe şa bû, dû re lihêfa dergûşê lê gerand û da pišta xwe. Pîrê paşê fistanê xwe jî ji par ve avêt ser û dû re jî bi laçika ku ji bo razanê davêtin ser çavên dergûşê, girê da.

Pîrê ev yeka tev li ser çongan dikir. Berê gopalê xwe da ser dergûşê û bi alîkariya dergûşê rabû ser piyan. Dû re gopalê xwe girt û di tariyê de hêdî hêdî ber bi derî hat. Hat ber şemûgê û di derî re li derva nihêrî. Ewrên ku li ser gund reş girê dabûn, şilopeya ku dibariya û bayê ku dihat, mizgîniya biharê didane pîrê.

Pîrê bi dîwar girt û ji şemûga derî



derket. Piçekî li derdorê xwe nihêrî dû re ber bi mizgeftê ve çû, lê li wir jî tu kes tune bû.

Pîrê carekê du caran bangî lawê xwe kir: "Mistoo.. Mistoyê min lawo" Lê tu kesî bersiya dengê wê neda. Wê hingê çend hêstir ji çavên pîrê bariyan û xwe bi xwe, "Te dît, van kûçikbavan em bi tenê hiştin di nav dijmin de. Niha ev dergûş jî bi min re nebûya, ji min re ne xem bû. Ez ji mala xwe dernediketim, heger dijmin tevî xanî ez bişewitandama jî ne xem bû." digot.

Dergûş digiriya û dengê dergûşê bi nav dengê pez, dewar û kûçikan ketibû. Pîrê piçekî li avahiyên gund nihêrî. Tam şêst sal berê hê hivdeh hijdeh salî bû hatibû vî gundî û bi Xalidê Koçer re

zewicibû. Bi hêvî û bi bawerî xwe dabû ber mala xwe. Xwedê çar keç û sê law dabûnê. Ji van, keçek bi tevî du lawan hê dergûş bûn, bi sorikan miribûn. Niha du keçên wê li gundê D. bimêr in. Keça wê ya mezin di gund de bi mêr e; mêrê wê Apê Xalit çend sal berê miribû.

Pîrê geh li cem keça xwe disekine, geh jî li cem lawê xwe Misto disekine. Lawê wê Misto, salên wî ketibûn çil û pêncan. Lawekî Misto derketibû çiyê û kes nizane li kîjan eyaletê ye. Misto çend caran ji destê arteşa tirk îşkence ditiye. Pîrê bi vî emrê xwe ev awayên gund, çer çêbûbûn û bi çi ked û emegî û bi destê kê çêbûbûn tev dîtibûn. Çend şahî û govend di vî gundî de çêbûbûn û

çend bûkên ser bixêlî di van avahiyan de bi miradê xwe şa bûne û bihêvî xwe dan ber malê dîtibû. Pîrê çiqas newal û mesil, çiya û banî, deşt û zozanên li vî deverê hebûn dizanibû. Dîsa, di geliyê Mûradê de û di van çiyaran de çiqas gund hebûn tev nas dikirin.

Pîrê, bi çavên tijî hêstir ber bi Çemê Mûradê ve meşiya. Caro caro lingên wê dişeqitîn û bi dijwarî gavên xwe diavêtin. Lastikên di lingên wê de tijî avbûbûn û gorên wê yên rîs şil bûbûn. Çemê Mûradê bi qasî kilometreyekê ji gund dûr bû. Pîrê xwe bi xwe digot: "Ew niha bi qayika Hemo derbasî wî alî avê dibin, ez dê zû bikim xwe bigihînim wan."

Pîrê hêdî hêdî di serberjêr re diçû xwarê. Ev serberjêr di eynê gavê de riya pez û dewaran bû. Gundiyar her rojdema nivro pez û dewarên xwe di vî serberjêrî de dibirin ser Çemê Mûradê av didan. Ji ber vî yekê çiqas berf dibariya, ji ber lingê pez û dewaran bi ser hev de didewisî û dibû wek cemedê.

Di van rojên biharê de dema ku berf hêdî hêdî dihele, ava berfê dibe wekî lehiyê û ji vî serberjêrî diherike. Niha dîsa di vî serberjêrî de av wekî lehiyê diherike û binê avê cemedok e. Ji nişkê ve lingê Pîrê şeqitî û pîrê li ser piştê li erdê ket. Gopalê wê di nav avê de çû û winda bû. Pîrê biqasî sed metroyî heta jêr di nav ava berfê de şeqitî. Dergûşa ku li pišta Pîrê bû ketibû û deng jê nedihat. Dengê sîlehan ji nav gund dihat. Leşkerên tirk ketibûn nav gund û mal bi mal dişewitandin. Ronahiya arava agir ji xaniyên ku dişewitîn radibû dida nav çavên pîrê. Pîrê bizorê rabû ser çongên xwe, kofiya li serê wê ketibû û porê wê bûbû wekî gijik.

Destê xwe da pišta xwe û li derdorê xwe nihêrî, dergûş tunebû. Mîna gureke har bû. Çavên wê sor bûbûn û kef bi devê wê ketibû. "Pitik. Pitika min." got û bi wan deran ket. Lê çiqas radibû ser piya, dîsa li erdê diket. Vê lebata Pîrê bi qasî niv saetê domand lê belê Pîrê pitika xwe nedîtibû. Tevaya wesîlan wê dilerizîn. Çongên wê sist bûbûn û laşê wê yê pîr ew nedikişand.

Arav bi gund ketibû û gund dişewitî.

Kumandarê leşkeran bangî leşkeran dikir: "Bişewitînin lawên min. Hilweşînin. Kevir li ser kevir nehêlin. Pez û dewaran, kûçik û pisîkan jî bikujin!"

Bi zelalbûna sibê re leşker ji nava gund vedikişiyar. Leşkerekî ji nişkê ve bang kir: "Kumandarê min, Kumandarê min, li vî derê pîrejinek û dergûşek geber bûne û bûne wek text..." got.

JÊHAT GIMGIM

Ziwanê Ma /Alfaba û yekgirtina zaravayên kurdî

Gava ku li naverok û ciwaniya vê pirtûkê tê temaşekirin, xweş diyar dibe ku amadekarê vê pirtûkê serê xwe gelekî pê re êşandiye û ji bo têgehiştina naveroka pirtûkê ji hêla xwendevanan ve, (çi biçûk û çi mezin) bi rengêkî nûjen, bi pêjinkerî û li gorî alfabeya Celadet Bedirxan ev berhem amade kiriye.

Bêguman, ji bo geşbûn û pêşdeçûna zimanekî; axaftin, fêrbûn, xwendin û nivîsîn pêdivî ye. Ji ber ku gelê kurd bi salên dîr û dirêj e ji van tiştan hatiye bêparkirin, di tevaya warê jiyandê de êşiyaye û gelekî jî vemaye.

Yek ji van êşên jiyana kurdewarî ya herî girîng jî, arîşeya xwendin û nivîsîna bi zimanê kurdî ya bi hemû zaravayan e. Gava ku em li rewşa zimanê kurdî ji layê zaravayan ve dinêrin, xweş tê dîtîn ku di nav zaravayên kurdî de, ên herî bextewer soranî û loranî ne û zaravayê ku herî kêmdeng maye û li ser kaxizan bi durîstî nehatiye xabitanandin jî, zaravayê kirdkî (dumilî) ye.

Zaravayên dîtirî kurdî, wekî kurmançiya jêrîn, ya jorîn û loranî, kêm zêde bi sed salan e li ser kaxizan tene xebitanandin û bi van zaravayan (bi taybetî bi soranî û loranî) bi hezaran berhem hatine nivîsîn û digel ku bûne zimanê xwendin û nivî-

sandinê û digel ku her yek û di nav xwe de yekgirtina devokan pêk anîne, her wisa nêzikahiyeke xurt jî di navbera her du zaravayên navbirî de çêbûye.

Zaravayê soranî li Başûr û li Rojhilat, digel pêkanîna yekgirtina devokên herêmî, tesîreke mezin li devokên kurmançiya jêrîn ên li derdora xwe jî kiriye. Ev mînak jî bo me xweş dide xuyakirin ku geşbûn û pêşdeçûna zaravayan, yekgirtina zimanê kurdî bi leztir û bi hêztir dixê.

Li hemberî vê bexteweriya soranî û loranî, em dikarin bi hêsanî bibêjin ku heta niha, di van bîst salên dawî de ji bilî çend nivîskarên ku hejmara wan hejmara tiliyên destan derbas nake bi kirdkî dinivîsîn, ev zarava, li dîv daxwazê ne xebat jê re hatiye kirin û ne jî hatiye xebitanandin. Ev jî bextreşîya vî zaravayê me ye.

Piştî vê kurtedaxuyakirinê, îcar em

bêne ser mijara xwe.

Di rêbendana 1997'an de, pirtûkek bi navê Ziwanê Ma/Alfaba, bi zaravayê kirdkî derket bazara kurdî. Ev alfabe ya ku ji 90 rûpelên rengîn û mezin pêk hatîye, bi destê Haydar Diljen, û bi devoka sêwrekî hatiye amadekirin û ji layê Weşanxaneya Nûjenê ve hatiye weşandin.

Gava ku li naverok û ciwaniya vê xebate tê temaşekirin, xweş diyar dibe ku amadekarê wê serê xwe gelekî pê re êşandiye û ji bo têgehiştina naveroka pirtûkê ji hêla xwendevanan ve, (çi biçûk û çi mezin) bi rengêkî nûjen, hêsan, bi pêjinkerî û li gorî alfabeya Celadet Bedirxan ev berhem amade kiriye.

Wekî li serî jî me daye xuyakirin ku her çende amadekarê pirtûkê devokê sêwrekî ji alfabeya xwe re kiriye bingeh jî, lê ji bo têgehiştina kurmanç û dimiliyên ku bi devokên herêmî dipeyivin, bi devokên sêwrekî, bîngolî, pîrankî û bi zaravayê kurmançî, deh rûpelên dawî ên pirtûkê ji ferhengokê re cuda kiriye.

Li gorî daxuyakirina berpîrsê weşanxaneya Nûjenê Ahmet Önal, ev renge xebat a Mamosta Haydar Diljen, ji sala 1984'an ve dest pê kiriye: Ji bilî Ziwanê Ma/Alfaba, berhemên Mamosta Diljen



ên ku heta niha derçûne ev in:

Zimanê Min-1 (1990)

Em kurdî bixwînin (1992)

Despêka rêzimana kurdî (1994)

Zimanê Min-2 (1997)

Bi kurtayî, ev renge xebat a Mamosta Diljen hêjayî şabaşê ye û di baweriya min de ev xebata wî, rêvekirineke hêsan e û xwe amadekirineke herî balkêş e ji bo yekgirtina zaravayên kurdî di bazara kurdî ya serbixwe de.

D.Ş TIZYANÎ

PEN'a Kurd dikare çi bike?

MEDENÎ FERHO



Her avanî (sazî) li ser bingehê geştî tê avakirin. Armanç û daxwaz li gorî vê bingehê tene diyarkirin. Helbet bûyer û pêhatî rewşê diguhêrin. Bandorê li ser karûbarê rojane dikin. Lê, armanç yek e û di nava xerxa bingeha avaniyê de cihê xwe girtiye. Yek e nabe du. Nûjenî û guherîna di nava vê armançê de li gorî pêwistiya civakî çêdibin. Ew jî bersivdana rojê û demê ye. Bersivdana rojê û demê bi armançên kin û dirêj cuda dibin. Her wiha piştî pêkhatîna Kongreya PEN'a Kurd ya sêyan van her du xisletên bingehî xwe diyarin kir û di panela roja dawî de ku ji teref MED-TV ve hate çêkirin derkete holê. Bêguman armanca her sazî û dezgehê li gorî bingeha avaniyê rêberî û serdariya civakî ye. Armanç çiqasî li gorî daxwazên pêşerojan û daxwazên demê hatibe diyarkirin-jî, rewş û encama rojane, bûyer û pêhatî dibine sedema guhertin û gavavêtinan. Ji ber ku sazî û dezgeh nikarin li pey demê, guhertin û pêşketinên civakî bimînin. Dema îro, pir bi hêz û xurt gavan diavêje. Cihanek-ter qerqesûn be jî, di nava guhertin û nûjeniyêke pir xurt û mezin de ye. Mirov bi xwe jî, di jiyana xwe ya rojane de nikare xwe li gorî vê bez û leza xurt û keftûlefa ter guhertinî nûjen bike. Êdî, erka mirov nemaye. Kompîter û internet... Her wiha makîne jiyana

rojane ya civakê nîşan dide. Lewre mirov êdî bûye palevaniyê gihiştina pêwistiyan. Em dikarin van dîtinan bi şiroveyeke kin û pir hêsa vekin...

Dêhna xwe bidin welatên paşketî... Mirovên wan, rojnameyên wan, çarşî û bazarên wan, ambalaj û trasporta wan, karbendî û pişesaziya wan, kewn û temtêla wan, heya bi kevir û kuç û ax û cotbariya wan paşketî ye.

Ev ne dîtinek, yan jî tezek e... Bîrdozeke zanistî û xwezayî ye.

Îcar, PEN'a KURD jî pêwist e ku li gorî armanca bingeha sazîyê, daxwaz û pêwistiyan rojanê kifş bike û gavên xwe biavêje. Berî her tiştî divê xweş bê zanîn ku PEN, qet naşibe tu sazîyên neteweyî. Ji ber ku bingeha wê ji teref hinek mirovên biyanî ve hatiye avêtin û armanca wê avaniyê hatiye diyarkirin. PEN'a kîjan welatî, kîjan gelî bête damezirandin divê li gorî wê armanca navendê xwe bide hev û gavên xwe biavêje. Lê, ew li hemberî her tiştî pêwistiya parastina mafê gel û civaka xwe berhembêz dike. PEN saziyek ku ji mirovên bijartî tê avakirin. Her çiqasî pêşî heya dema hatî sar kirin, PEN'a KURD xwe di nava vê bijartinê de nedabe diyarkirin, û di nava xerxa berjewendiyên kesayetî de hatibe perçiqandin jî, îro, yanê piştî kongreya sêyem pêwistiya bijartin û berhembêzkirina dofi:eh hate dîtîn. Mixabin şikestî û polemikên di navbera çinê bijartî de ku êdî li her kuçê û kozîyê xwe diyar dike, derketiye hemberî vê sazîyê. Helbet civaka me jî ne pêşketî ye. Ev xislet divê ku bi vê çina bijartî re jî hebe. Ku nebe xwezayî nîn e.

Bêguman asteng çî bin pêwistî pê heye ku PEN'a KURD, mîna PEN'a her welatî rola xwe bileyze. Li gorî min, bêhtirîn ji PEN'ên welatên din divê ew hewl bide û li hemberî pirsgrêkên

mezin ê nivîskarên kurd û Rojhilata Navîn derkeve û rola xwe bileyze. Ev rol, têkilî ne. Têkilî jî bi du cureyan çêdibe. Têkilîyên derve û têkilîyên hundir.. Bawer dikim ku pêwistiya bi dorfirehî vekirina van têkilîyan û amanca wan tune ye. Ji ber ku pêwistiya têkilîyên hundir bi qasî têkilîyên derve, wê li ser pêşeroja PEN'a KURD bandorê bike.

Bi zimanekî vekirî dibêjim ku çand û wêjeya kurdî di bin perçiqandina polîtîk de ye. Çina bijartî jî ji çêlî û misrîtiya xwe nikare xwe ji bin vê bandorê minê ferê aşê hêrandinê derxe. Lewre karekî zor li pêşîya rêvebirên PEN'a KURD heye. Ne hêsa, bi kotekî divê ku berçavkên çina bijartî bêne guhertin ku PEN'a KURD malê her kesê xwedî huner û cewher e. Heger lê xwedî derketin hebê PEN'a KURD wê bibe malê gelê kurd û di nava civaka hemdemî de cihê xwe bigire. Heger li gorî berjewendiyên rêxistinîyan, yan jî berjewendiyên kesayetî lê binêrin û qet balê nedin daxwaz û pêwistiyan qonaxa îro, kar zor e. Heya îro vê çina bijartî hewl nedaye û bi hime-teke xurt a bihêz ranebûye ser xwe û roleke giran di nava civaka kurdî de nîşan nedaye. Ji bilî rêxistinîyan wan kesan jî giraniyek nîşan nedaye. Dema ku sazî û dezgehên pişesaziye rola xwe nelîzî, giraniyê nîşan nedin, kes jî wê di nava gevîzîna fetisandî de bimînin. Her wê cewherek korîşkî çilmisî hilweşînin. Pêwistî bi hişmendî û mijûlahiya entemasyonalfî heye. Helbet ev hişmendî û mijûlîyê jî ber pêpelûka deriyê malê dest pê dike. Û, mirovê ku li ser xwe nexeyide, nikare li ser tu mirovî bixeyide. Ev gotîna pêşîyan ne li gorî gotinên hevokê sivik e. Li ser mijûlî bibin û şirove bikin. Çina bijartî divê ku li sazîyên xwe xwedî derkeve û xwe bigihîne qonaxa hemdemî.

Senedê derewîn sedema revê ye

Kalek heye, rezê wî gelek in. Her sal ku tirî digihîje, rovî dikevin rezê wî û tiriye wî dixwin.

Rovî fêm dikin ku xwediyê rez kal bûye û êdî nikare rezê xwe biparêze. Serokê roviyan dixwaze ji wê rewşê îstîfade bike. Gazî hemû roviyan dike û wiha dibêje: "Gelî roviyan, min ji we re rezekî bi îcare girtiye. Hem jî min bi sened û ewraqê têkûz û saxlem peyman çêkiriye. Yanê rez di destê me de ye."

Ji ber ku rovî her sal rezê kalo û tiriye wî dixwin, kalo jî dema tirî şîrîn dibê, du heb çêlikên şêran tîne li ber rez girê dide, da ku notirvaniya rêz bikin. Di wan rojan de koma roviyan û bi serokê xwe ve, bi ser rez de digirin û rêz li hev par dikin.

Serokê roviyan bi awayekî ji xwe bawer dizivire ser hevalên xwe û wiha dibêje: "Qet ecele nekin, hedî hêdî tiriye xwe bixwin, rez di bin destê we de ye. Peymana me tekûz e, lewre bi mohra reş hatiye morkirin."

Di wê demê da dengê roviyan diçe kalo. Kal jî li quncikekî rez di bin darekî de rûniştî ye. Bi dengê roviyan re radibe ser xwe, dinihêre ku rovî ketine nava rez. Hema diçe xeleşê stûyên şêran vedike û wan berdide nav koma roviyan. Gava rovî şêran dibînin, baz di-



din. Serokê wan li pêşiya gişkan direve. Hinek rovî kulek, çilmisî û lewaz bûn, ew li paş dimînin. Li paş xwe mêze dikin, dinihêrin ku hema hema şêr wê bigihîje wan. Bi hawar û qîrîn gazî serokên xwe dikin: "Serokê devqîç, serokê devqîçî. Hela wan sened û ewraqan derxe û were ji şêran re bixwîne.

Da ku bila bizanibin me rez îcare kiriyê." Serokê wan ê devqîç, dizivire û dibêje: "Di vê xezeb û bahozê de kî vala ye senedan derxîne, kî dikare bixwîne û kî dikare guhdar bike. Sened û ewraqê me tevan di rev û xelasiyê de ye. Kuro çelmisîno, zorê bidin revê."

MIHEMED MUHEMED

Şimdi û kumandar

Rojekê li gundekî Kurdistana, mirovek hebûye, navê wî "Şimdi" bûye. Di gund de jî gel zêde zimanê tirkî nizanibûye. Îcar gelê ku di gund de bûne hemû dibin welatparêz. Rojekê kumandare qereqolê tê gund û diaxive. Di destpêka axaftina xwe de hetanî dawiyê gelek caran dibêje "Şimdi!" Wê roj jî ew mirovê bi navê Şimdi çûye çolê karê xwe dikei Kumandar dibêje: "Şimdi hepiniz teroristlere yardım ediyorsunuz, hepinizi idam ederim û şimdi şöyle, şimdi böyle." (Vê gavê hûn hemû alikariya terorîstan dikin, ezê we gişkan bidalîqînin) Axaftina xwe diqedîne û jî gund diçe. Dema ew diçe, Şimdi jî, ji çolê tê malê. Gundî diçin pêşiya wî: "Welahî û bilahî mala te şewitî. Agir ketiye ser canê te. Kamandarê qereqolê hate gund û hemû axavtinê wî li ser te bû. Serê gotina wî şimdi û binê gotina wî şimdi û nav gotina wî jî şimdi bû. Û hema jî gund zû derkeve xwe xelas bike. Em bi dîn û îmana xwe dikin, wê te daliqîne." Dema wisa dibêjin, Şimdi wiha dibêje: "Welah min bi dar ve bikin jî, ez ji gundê bav û kalê xwe dernakevim."

RIYAD AHMET HESEN

BIXELAT...

XAÇEPIRSA BIXELAT (56)

XAÇEPIRSA

S	B	A	E	E
D	Y	R	B	K
O	A	Ü	Z	R
S	A	R	K	E
R	M	E	R	A
Ö	P	E	N	D
X	A	R	E	W
S	Ü	X	T	L
K	I	R	D	A
B	I	R	A	N



Bersiva Xaçepirsa 54'an

Xaçepirsa me bixelat e. Di 15 rojan de çî bersiv bigihîjin me, emê wan binirxînin û bi rîya pişkê li 5 kesan belav bikin. Xelata hejmara me ya 56'an pirtûka ANTOINE DE SAINT-EXUPÉRY (MÎRZAYÊ BIÇÛK) ye

Jêrenot:
Ji bo ku bersiva we bê nirxandin, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsê de binivîsin û tevî adresa xwe ji me re bişînin.


MÎRZAYÊ BIÇÛK

Antoine de Saint-Exupéry




Pênc kesên ku xelata xaçepirsa hejmara 54'an, pirtûka Jak London "Zaroka Şevê" qezenc kirine: Yılmaz Melek/ Stenbol, Abdullah Bakî/ Bursa, Fehat Yaevuz/ İzmir, Ab... an Dengiz/ Edere, Can Akak/ Sêwaz


Hêjar... (wêne) Ziyaret	Hine hızr, fikir	Cureyeki ahif Histiri kelem	Giyanekek Qertafa neyenyê	Cihê kavil bûyî Mirişka avî	Bêdera gemyan
				Nan li ser çêdtkin	
				İntac	
Xweş, ctwan Masiyekî kujer			Ekonomî İyot		
			Sureyek ji Quranê Kovareke kurdî		
Notayek Razikirin		Cesûs, sixur	Gorepana cengê Cinavkeke kesane		
			Cinavkeke işarkî Ava kirin		
Netice, akam		Wargeh Rîh, gıyan			
			Koka peyva şuştinê Kuçik		
Nasandîn, terif					
Şet					
		Lehiya berfê			



PEYVA VEŞARÎ



«Leşker ji bo mayînan
bibînin gundiyan bikar tînin»



Warê Zembîlfiroş û Gul Xatûnê bajarê Silîva

Destpêk rûpel 16

Di roknivîsê kurd û xanedan Şerefxanê Bedlîsî, di Şerefnameya xwe de behsa Mîrên Silêmanî dike. Şerefxan dide zanîn ku van mîran li Pasûr(Qulp) û Farqîna Amedê hukumdarî kirine.

M. Emin Bozarslan Şerefnameya ku çarsed sal berê (1597) bi farisî hatiye nivîsîn, ji erebî wergerandiye zarê tirkî. Kesê ku berhem wergerandiye erebî jî rehmetî Muhammed Alî Avnî ye.

Di rûpela 14'an de ligel peyva Silêmanî di nav perantezê de peyva "Silîvanî" hatiye danî. Paşê jî bi jêrenotekê hatiye xuyakirin ku ew nafê Farqîna Amedê ye. Îcar di rûpela 292'yan de, ligel peyva Silêmanî di nav parantezê de "Süleymanî" hatiye danîn. Dîsa bi jêrenotekê hatiye diyarkirin ku ew beramberî Silîvanî ye. Em daxuyînin ku her du jêrenot jî aîdî M. Emin Bozarslan in.

Ez bi xwe ketim gumanê ku Şerefxan bi xwe kîjan peyv bi kar aniye.

Gava em ji aliyê fonetîkê ve li ser peyvên "silêmanî û silîvanî" rawestin û wan dahûrînin, em dê bibînin ku her du peyv ji aliyê teşe ve ji hev ne dûr in. Koka wan yek e. Dengên di ziman de bi hev diguherin. Di peyvên me de dengên "m" û "v" bi hev guherîne.

Ji bo vê yekê ez dixwazim nimûneyeke din ji pêşkêş bikim. Di sala 1988'an an jî di

sala 1991'ê de bû baş nayê hiş û bîra min. Bi rastî hingî li welatê me bûyer bi lez diqewimin bîra me têra ve lezgîniyê nake. Ji Başûr gelê me derbasî Bakur bûbû. Rojnameyê tirk bi serokekî Eşîra Silîvanî re peyvîbû. Di rojnameyê de hem peyva Silêmanî û hem jî ya Silîvanî hatibû bikaranîn. Rojnamevan dabû zanîn ku her du nav jî, ji bo eşîrê tene bikaranîn.

Ev eşîra hanê, ez ne şaş bim li navbera Dihok û Zaxoyê bi cih û war e.

Lî rojhilatê welatê me jî navê deverekê Silvana ye ku nêzikî bajarê Wurmîyeyê ye.

Mihemed Cemîl Paşa, di hejmara 39'an a Hawarê de (15 sibat 1942) nivîsek bi navê "Çiyayê Silîvan" dinivîse û ji aliyê cografî ve vî bajarî dide naskirin. Ew, navê Farqînê bi kar nayîne. Ev jî tiştêkî balkêş e. Her wiha, xwediyê Hawarê Celadet Bedirxan, di hejmara 34'an de (15 Çiriya Pêşin 1941) nivîseke dirêj bi navê "Ji Eşîrên Botan: Jêliyan" dinivîse, bi bernavê xwe yê Herekol Azîzan.

Celadet Bedirxan di vê nivîsê de dide xuyakirin ku eşîrên Botan sî, sî û pênc (30, 35) heb in û ew jî tevde silivî ne.

Me berê eşkere kiribû ku emê li ser meselaya "Mîl û Zil" rawestin. Celadet Bedirxan, dîsa bi bernavê Herekol Azîzan, di hejmara 12'an a Ronahî de (1 Adar 1943) bi sernavê "Mîl û Zil, Bir û Esasên Eşîrên Kurdan" xebateke xwe ya hêja û ew çend jî balkêş diweşîne. Celadet Bedirxan dibêje:

"Lê di nav eşîrên Kurdistanê de jê biesastir teqşimek heye. Ew jî birên Mîl û Zil e. Mîna ku herkes pê dizane eşîrên kurdan bi bingehên xwe ve vedigerin du bend û cihderkan: Mîl û zil. Yanê her-



Minara Qot, 400-500 metre li rojhilatê başûrê bajêr dikeve. Miñare ji Eyûbiyan maye û 5 qat e.

çî eşîrên Kurdistanê hene an mîl in an zil in. Ji zil re siliv jî dibêjin. Mîrov jî kîjan kurdî bipirse, ewê taval bibêje, ez mîl im, an, ez zil im."

Mîr Celadet bi van gotinan tenê qîma xwe nayîne û bi jêrenotekê jî van agahiyan dide: "Herwekî nas e îro jî li Kurdistanê bi van navan eşîrin hene: mîlan, zilân, silîvan. Lê em nizanin esil ew in an piştê ev nav bi wan ve bûne."

Emê bi bîr bixin ku peyvên mîna "Silvana", "Silvano" û "silviyo" di zimanê îtalî de hene. Her wiha navê navçeyê Stenbolê jî Silivîrî ye. Gerek dike ku em bibêjin "Silivîrî" ne navekî bi tirkî ye.

Di encamê de em daxuyînim ku "Siliv" û hemû peyvên ku jê çêbûne, bi kurdî ne. Têkiliya wan bi tirkî nîn e. Întimal e ku pêwendiyek di navbera peyvên "silîvan, siliv û silvan" a kurdî û di yên îtalî "silvana, silvano û silviyo" de hebe, ji ber ku her du ziman jî ji koma hind-ewrûpî ne.

Şehîd nemir e wekî şax wekî befir, wekî dirext wekî bihar û gulebax. Şehîd av e, tîniya zevîyan dişkine. Pençew dest e êşa xak radihejine. Kilê çav e çend diwadûr roj dibîne.

Şehîd al e bi qandî bilindiya Kurdistanê Dilê azadî û bilindtirîn gopîka helwesta insan e...

Şerko Bêkes

Di şexsê te de em hemû rojnamevanên ku ji bo azadiyê şehîd ketine bi bir tînin û em di riya we de dimeşin.



CENGİZ ALTUN (1968-1992)

Li ser navê malbata Altun dê û bavê wî Tûkiye Altun û M.Emin Altun.

Rojnameya Hefteyî
(Haftalık Gazete)

Li ser navê
Zerya Basın ve
Yayıncılık
San. Tic. Ltd. Şti.
(adına)
Xwedî (Sahibi)
CELALETTİN
YÖYLER

NAVNİŞAN
Ayhan Işık Sk. No:23/3
Beyoğlu / İSTANBUL
TEL-FAX
(0 212)
251 90 13

Gerîndeyê Weşanê
(Yayın Yönetmeni)
SAMİ TAN

Berpîrsê Karên
Nivîsaran
(Yazı İşleri Müdürü)
DÜZGÜN DENİZ

Berpîrsê Saziye
(Müessese Müdürü)
TAHİR ELDEMİR

ÇAPXANE
Yeni Asya Matbaacılık
A.Ş.

BELAVKIRIN
BİRYAY Dağıtım

NÜNERİTİYÊN ME
(Temsilciliklerimiz)
Nimîndeyê Giştî
yê Ewrûpayê:

M. Rojava
Suriye: Jan Dost
Helim Yüsv

Berlin:
Silêman Sîdo
49-30-69002695

Hannover:
Selîm Biçûk
49-5721-81360

Munchen:
Mahmut Gergerli
49-871-670884

Bruksel:
Medenî Ferho
32-02-466037

Stockholm:
Robîn Rewşen
46-8-7510564

Bonn:
Ahmet Baraçkılıç
49 228 66 62 49

Celle:
Wezir Saçık
49 50 52 87 36

Warê Zembîlfiroş û Gul Xatûnê bajarê Silîva

Xwediyê Hawarê Celadet Bedirxan, di hejmara 34'an de (15 Çiriya Pêşin 1941) nivîseke dirêj bi navê "Ji Eşîrên Botan: Jêliyan" dinivîse, bi bernavkê xwe yê Herekol Azîzan.

Celadet Bedirxan di vê nivîsê de dide xuyakirin ku eşîrên Botan sî, sî û pênc (30, 35) heb in û ew jî tevde silîvî ne.

ZANA FARQÎNÎ

Me bi zanebûn di cihê "Farqîn"ê de "Silîva" di sernav de bi kar anî. Ji ber ku ev peyv mijara nivîsa me ye. Her çiqas di nav gelê bajêr de îro tenê ev her du nav ên şarê Zembîlfiroş û Gul Xatûnê bê zanîn jî, vî cihê dêrin ji gelek şaristaniyan (medeniyetan) re warîtiyê kiriye û xwediyê gelek navan e, wekî Martyropolis, Tigra-nokerta, Meyafarqîn an jî Miyafarqîn...


Ev bajarê dîrokî ji Dewleta Merwanîyan re bûye paytext û malbata Badê Kurê Dostik rêç û şopên xwe li bajêr hiştine. "Çêlek çûne danan yekê xwedan dudu yê Mala Merwanan", ev jî gotineke pêşîyan e ku ji wê demê maye.

Ji ber ku me dil nîn e em ji dîroka bajarê Egîdê kurdan behs bikin, hema em bi tenê bibêjin ku tê gotin Farqîn an jî Silîva ji Amedê kevntir e.

Sûr û bedena li bajar ku bi kevirên spî yên pir gir û qirase hatiye avakirin, ji neyaran re serî natewîne û wiha deng dike li wan: Gelek kes hatin û çûn, lê ez li wir im!

Ez fêmerî xwe bûme nebûme, navê bajêr Farqîn û yê gelê herêmê jî silîvî bûye. Heta kesên ji bajar û navçeyên dorê ne, jê re Silîva an jî Silîvan digotin. Vê rewşê hema bibêjin qet bala min nekişandibû ser xwe, heta ku ez ji bo xwendina lîseyê neçûbûm Stenbolê. Hevalê min ê sinifê yê ji Dutaxa Agiriyê ji min pirsibû ku ez ji kîjan eşîrê me û eşîra min jî, milî ye an silîvî ye. Min navê êl û eşîra xwe qenc dizanibû, lê min nizanibû ku ew ji kîjanê hatibû. Tenê min gotibûyê ku gelê herêmê ji xwe re dibêjin silîvî.

Ev pirs bû sedem ku hinekî be jî ez li ser navê "Silîvan" rawestiyam. Vê gavê baş tê bîra min ku, min li Kitêbxaneyê Dîbistanê li "Ansiklopediya



Ev koşka ku Mala Beg (ustunî), ji Eyûbiyan Melîk ul Kamil Muzafer maye.

Hayat"ê nihartibû û ez li peyva "Silîvan" gerîbûm. Min ew dîtibû. Der barê peyvê de dihate gotin ku ji ber kurdên silîvî li bajêr bi cih bûne lewma navê "Silvan" li vî warê kavilbûyî hatiye kirin.

Wê dêhna we kişandibe ku dengê "î"ya peyvê ya di navbera dengên "î" û "v"yê de nîn e.

Mamosteyekî me yê ji Eskîşehîrê, ji me hemûyan wateya navê bajar û navçeya ku em jê ne, pirsibû. Min jî agahiyên ku ez ji ansiklopediyê hîn bûbûm, jê re gotibûn. "Camêr", çaxê ku peyva "kurdên silîvî" bihistibû eniya xwe qermeçandibû. Paşiyê em pê hesiyam ku ew nijadperestekî tirk e, heta li me gilî kiribû ku qaşo em xwendevanên kurd ên li dibistanê tim bi hev re digerin û propagandeya kurdîtiyê dikin.

Di pey re em bi ser hin agahiyên din ve jî bûn, ên der barê peyva ku mijara nivîsê ye.

Ev hay û agahî hema bibêjin ku bi me re man, kêman caran di sohbetan de me ev vedigotin. Niyeteke min a ku ez dê nivîseke taybet li ser "Silîvan" binivîsim tu nehebû; heta nivîsa mamoste Şükrü Gülmüş a bi navê "Hosteyê min Azîzê Suryanî" (Azadiya Welat, hejmar 41, rûpel 11). Gülmüş, tê de li ser guhartina navê Farqînê bi "Silvan"ê ji

aliyê tirkan ve, sekinîbû. Ev nivîsa mamoste bû sedem ku ez der barê wê de tiştinan bibêjim.

Pêşî em ji zargotina kurdî dest pê bikin. Di zargotina me de em rast li peyva "Silîva" tîn. Nimûne, destana



Kela Zembîlfiroş; li gorî gotina wezîrê Emîr Ebû Qasim Ahmed Nasrûdewle bîn Merwan, Ebûl Qasim di 1007'an de hatiye avakirin.

Siyabendê Silîvî û Xecê. jixwe, di dema zaroktiyê de gava min li vê destanê guhdarî dikir, navê Siyabendê Silîvî, nemaze peyva "Silîvî", pir bala min dikeşand. Dikir ku dilê min lê germtir bibe. Li aliyê din, devera ku destan lê qewimiye der û dorê Çiyayê Sîpanê Xelatê ye. Ev li ku û Farqîn lu ku? Bi wê rewşa xwe ya zaroktiyê me ji mezinên xwe pirs dikir ku ka Çiyayê Spîna Xelatê li ku dikeve? Bersiva wan ev bû: "Lawo dibêjin li aliyê Wan û Bedlîsê ye."

Ji straneke zarokan ku li Farqînê tê gotin:

Qurban bim bi kî va
Tilî Begê Silîva
Heçî Axayê Milî va
Emê ji te re bikin kirîva.

Ji ber ku wê pişt re ji çîroka "Mîl û Zîl" bê behskirin, vê gavê ezê her du peyvên di stranê de "silîva û mil" destnîşan bikim û hew.

Helbestvanê neteweyî û bavê ramanê neteweperweriya kurd nemir Ehmêdê Xanî di Mem û Zînê de, navê sê destanên vokên kurmançî bi lêv dike:

Bohtî û Mihemedî û Silîvî
Hin le'î û hinek ji zêr û zîvî
Sêsed sal berê Nemir Xanî peyva "Silîvî" bi kar aniyê.

Dûmahîk Rûpel 15